

POPKURD

SEYWAN SEIDIAN

“Partiyên kurdan ji bo çand û hunera kurdî jehr in.”



PoPirs | SAKÎNA TÊYNA



Xem | RAPA KURDÎ



Kînem Şahîn | KURDORÎNO



BERÎYA HER TIŞTÎ LÊBORÎN!

Di hejmara din de me bêyî destûr nûçeya wan weşand,
em ji Ferit Demirel û ji hemû malbata Bianetê
lêborîna xwe dixwazin.

Edîtoriya Popkurdê

Merheba PopKurdhezên xweşik û delal. Me gelekî bêriya we
kir. PopKurd bi we xweştir û geştir dibe. Me xwest em hejmare-
ke bi dilê we hazir bikin û va ye hejmara 5emîn li ber 'tiliya' we
ye. De bifermin.

POPKURD
06/2019 • Jimar 5

Edîtor

Mistefa Dogan

Edîtorê Ditbarîyê

Ridwan Xelîl



+90534 325 3629



popkurdkovar



PopKurdKovar



PopKurdKovar



popkurdkovar@gmail.com



popkurdkovar.wordpress.com



channel/UC7OVendzXoCAzJC2wf_KVYw

NAVEROK

04

RIHLETGUZÎN - PORTO RÎCO
Mihemed BÎLEN

10

WHATSAPPA MEŞHÛRAN
POPKURD

12

ZEWAC 1
Egîd Fîrat

13

ZEWAC 2
Recep Çiçek

15

POPPIRS
ME JI DERHÊNERÊN KURD PIRSÎ
POPKURD

24

CÎGERA DIYARBEKIRÊ Û
ÇEND MEKAN
Neşet Girasun

26

Mihemed Şêxo

Xêz:
Salome Cizrawî, Jiyan Munzur

27

RAPA KURDÎ
XEM

30

KURDORÎNO
Kînem Şahin

33

ROPORTAJ: SEYWAN SEIDIAN
Ersîn TEK - Omer Bextiyar

42

Me ji 10 kesan pirsî
POPKURD

42

POPPIRS: SAKÎNA TÊYNA
POPKURD

42

Ji berê ta îro Kurd çî
Dixwin çî Vedixwin
MEHMET AYDIN

BI ÇEND DOSTAN RE LI
PARZEMÎNEKE DÛRÛDEREZ;

PORTO RÎCO



RIHLETGUZÎN

Mihemed BÎLEN

mehmetihsanbilen@gmail.com

Yek ji wan welatên dê neyê bîra kes-ekî/ê ka rojekê pêjna wî/wê pê bikeve yan na Porto Rîco ye bawer im. Ji ber ku ji bilî sefereke turîstîk divê sedemeke we ya baş hebe ji bo çûyîna Porto Rîcoyê. Wekî gelek rêwîtiyan, çûyîna Porto Rîcoyê jî bi serê xwe derdek e. Riyeke dûr û dirêj, lêpîrsînên belasebeb, mesrefeke zêde û bi ser de jî mecbûriyeta vîzeyaya Emerîkî. Jixwe ne ji ber van sedeman be, geştiyarên ku li cîhanê digerin dê ji niha gelekî zêdetir bin.

Çîroka Serkan û Sharon

Daxwaza çûyîna me ya Porto Rîcoyê, bi tesadufeke balkêş dest pê kiribû. Serkanê hevalê me yê ku gelek rêwîtiyan me bi hev re bihurandibûn, li ser medyaya civakî keçeke Spainî ya bi navê Sharon nas kiribû. Piştî florteke kurt a online, Sharonê dabû rê û li dû Serkan hatibû Stenbolê. Demeke dirêj bi hev re jiyabûn û bûbûn du felqeyên sêvekê. Me jî Sharon li vir nas kiribû. Ji ber gazî û hawarên malbata Sharonê bo vegera malê, bi Serkan dabû qebûlkirin da biçin Porto Rîcoyê û li wir bi cîh bibin. Çûbûn. Çûbûn lê, hesabê wan li hev derneketibû û Serkan piştî çend heyvan, bi tena serê xwe vegeyabû Stenbolê. Sharon ji binemaleke

qedîm a San Juanê bû û tekane zaroka malbatê bû. Bi ser de jî arkeologeke naskirî bû. Di nav van kar û berpirsiyariyên Sharonê de, Serkan xwe wekî zêde û îhmalkirî hîs kiribû û vergeriya bû mala xwe. Biryara vegeerê her çiqas bi destê wî be jî, hiş û giyanê xwe li San Juanê hiştibû. Piştî vegeerê, Sharon çend carên din hatibû û di hatineke xwe de em jî dawetî Porto Rîcoyê kiribûn.

Piştî çend rojan, dawetnameyeke taybet ji Vîkîya dayika Sharonê hatibû ku ew bi xwe profofesor bû li zankoyeke San Juanê. Bi saya vê yekê, me vîzeyaya Emerîkî bi lez û bi hêsanî girtibû. Piştî rêwîtiyeke dirêj, em li balafirgeha San Juana paytexta Porto Rîcoyê peya bûbûn û Sharon jî hatibû pêşiya me û em biribûn cihê ku em ê lê bimînin... Xaniyekî çewligê bifikirin ku di nav daristanên baranê (Forest Rain) de tekane avahî ye û çemeke gurr ji ber diherike. Saet hê nebûye nîvro, bo bêhnvedan û razanê em her sê li vir bi cîh dibin û li ser saeta şîvê em li hev dikin ku bi malbata Sharonê re, li mala wan a nav bajêr bi hev re bin.

Divê geştiyar ji bîr neke ku nava rojê cihê razan û xwe rehetkirinê bi tenê balafir e. Nexasim piştî rêwîtiyeke transatlantîk, bo hûn nebin Jet Lag, divê dema hûn gihaş-



tin cihê xwe, derkevin ronahiya rojê û heta dinya tarî nebe raketinê neynin bîra xwe. Ji bo yên nizanin Jet Lag çi ye, bêjim. Di rêwîtiyên dûrûdirêj de leza guherîna bedena mirovî ji ber ku nagihêje leza guherîna saetê, beden li pey wext dimîne û ev yek jî hin nerehetiyên bedenî û derûnî çêdike. Bo vê yekê ev nav lê kirine. Yanî bi çolbirî mirov bêje, têkçûna rîtma bedenê û sergêjîya ferqa di navbera saeta lokal û ya welatê hûn diçinê ye, Jet Lag.

Şelaleya La Mînayê

Piştî hevrêyên min kişiyên odeyên xwe, ji bo kişifkirina derûdorê bê sebr bûm. Bêyî ku rahêjim telefon û pasaporta xwe, bi tena şort û tîşort û kilaşeke nîv-girtî, ber bi xuşîna avê ve meşiyam. Deng ji cihekî pir nêzîk dihat. Bi her gavê deng berztir dibû lê ne av ne jî pêjna wê xwiya nedikir. Ji ber zexmiya daran şiverê fetlînokan li xwe bada bûn, poşmaniya derketina bi kilaşê, ji niha ve ez aciz kiribûm, lê heta min çavkaniya xuşîniyê nedîta ez ê venegeriyama... Heta hingê min keskeke wisa tarî nedîtibû, tîrêjên ji nav darên ku bilindahiya wan

digihast sed metreyî dinizilî, dîtbariyeke mûazam pêk dianî. Metirsiya wendakirina riya vegeerê, bi her gaveke min re geştir dibû. Ez li ser van endîşeyan difikirim ku hew min dît ez li ber wê dîmena muhteşem sekinîme. Şelaleyeke ezamet li pêşberî min bû ku serê wê li ku û li kîjan alî bû, nedihat dîtin. Çawa ku peyv û pêkhatin “Xweza”yê, zayineke xwebixwe tîne bîra mirov, eynî bi wî rengê xwe yê siruştî û bakîre li hemberî min bû û min ji xwe re lê temaşe dikir. Di wan kêliyên ewil de min xwe wekî Alîsa li “Diyarên Nuwaze” hîs kir. Ewqas bi kêf bûm ku lawir an jî balindeyeke dirinde derketa pêşiya min, belkî ez netirsandama.

Digel ku bajarekî paytexta giravdewl-etekê ye; San Juan, têra xwe mezin û dewlemend e. Mîmariya bajêr wekî gelek deveran dibe du beş, bajarê kevnare û yê nuh. Li aliyê bajarê dîrokî, parek avahî di bin tesîra mîmariya Spainî, parek jî di bin tesîra mîmariya Emerikî de ma ye. Mirov dikare bêje mîmariyeke dewlemend û biheybet lê ne xwedî xweserî û reseniyeke.

Christoph Colomb dema ev girav dibîne, çend qebîleyên qedîm li vê erdê dijîn. Ev qebîleyên niştecih ên vê giravê, madenên




zêrên xwe pêşberî Colomb û hevalên wî dikin. Piştî hingê, qedereke nû ji bo wan tê nivîsîn. Ji kawikî an bi zanebûn ev yek kirine kes nizane. Piştî çav li van madenan dikeve, Colomb navê Porto Rîcoyê li vir datîne, yanî “lengergeha dewlemend.” Niştecihên bajêr, bi piranî ji Spainîyan pek tèn.

Du zimanên fermî yên welêt hene, Spainî û Îngilîzî. Hejmara katolîkan ji ya protestanan du qat zêdetir e. Mirovên Puerto Rîcoyê di nav giravdewletê Carrabienê de, wekî yên Kubayî pir germ û ji dil tèn naskirin. Sembola welêt beqeke

pir biçûk a bi navê Coqui ye. Dema kesek behsa welatperweriya xwe dike, dibêje, “ez jî bi kêmanî bi qasî beqa Caqui Porto Rîcoyî me.”

Ber êvarê mazûvana me Sharon hatibû pey me. Heta saeta şivê em ê li nav bajêr bigeriyana. Piştî me çend qor li nav bajêr xistibûn, em li ber bareke ku bi flamayên mor hatibû dorpêckirin rawestiyabûn. Tam me di dilê xwe de digot dîsa em pêrgî feminîstan hatin ku, Sharonê got “ev flamayên hûn dibînin yên partiya me



ya Sosyalîst in.” Ev partiya bi navê PPT wekî HDPê, banenaveke partiyên çepgir bû. Dema em ketin barê, bi dehan kes silav û xêrhatin li me kirin. Ya pêşî bala min kişand ji partiyekê wêdetir, wekî meşa Prideyê bû û bîra wekî avê dihat vexwarin û ji kuran zêdetir keç hebûn. Min di dilê xwe de got xelk çi şoreşê dikin, yê me jî encax cixareyê bikşînin, çaya tarî vexwin û fesadiya hev bikin. Paşê min bihîst ku bar bi xwe jî ya partiya sosyalist e û partî heta civînên xwe jî li vir çêdike. Wisa diyar e ku li welatên tropîk, hewayaya polîtîk jî wekî hewayaya cografîk ne kêşeyeke ku mirov li ser bifikire û endîşe bike ye. Hewa di her demsalê de kê-m-zêde wekî hev e. Her werza wê teqlek bihar, piçek jî havîn e.

Çêjeke efsûnî: Moricilla

Di şîvê de kevaniya malê Vîkiyê bi ser re fûrandibû. Nimûneyên ji xwarinên Spainî yê tropîk bigire heta yê ji Toinoyan(qebîleya niştecih a qedîm), gelek tişt hebûn li ser maseyê. Wekî mînak; Arroz

Con Gandules, Mofongo, Rostoya Berazan, xwarinên sereke bûn. Ya herî zêde bala min kişandibû Morcilla bû. Naveroka Morcillayê pir balkêş bû. Xwîna germ a berazê nû serjêkirî, bi gelek celeb beharat û birincê re tevîhev dikin û bi wî malêz û heşûyê roviyê berêz dadigirin. Ji bo ziwa bibe demeke dirêj li ber tavê dihêlin û di encamê de sicûqeke pir ecêb derdikeve. Wekî prensîb; di van geştan de hemû pêşdaraziyên xwe li malê dihêlim. Heger xwarinek bi sedan salan nehatibe jibîrkirin û hê jî ji bo hinekan bi lezzet be, ew xwarin tehmkirinê heq dike. Piştî xwarina Moricillayê bi dilekî rehet dikarim bêjim, tehmeke wisa bû ku her êvar di şîvê de bê ber we, hûn ê jê aciz nebin.

Ji ber ku welatekî dewlemend e, bi rehetî hûn dikarin li ber her xaniyekî sê çar trimbêl û li her malê sê çar sarincên dagirtî bibînin. Ji van sarincan yek jê bo bîraya Medallayê ya neteweyî hatiye terxankirin. Di rojekê de vexwarina deh bîrayan, tiştêkî pir ji rêzê ye li wir. Ji ber çanda wan a xwarin û vexwarinê, bi piraniya mirovên



San Juanê re problema obezîteyê heye. Gotineke dawî li ser xwarinê, Churrascoya ku Arjantînî û Brezîlî li ser şer dikin li San Juanê tehm bikin. Bibînin ka di vî warî de kî berx e, kî beran e!

Li ser masê çar nifşên ji malekê hazir bûn. Umîyê lawkê Sharon, Vîkiya dayika wê, Lydiaya dapîra wê û ew. Têkiliyên vî çar nifşî wekî yên çar hevalên xwedî xisûsiyetên cihêreng lê di nav xwe de senkronîze bû. Ji kêliya ewil heta ya dawî mirov xwe rehet hîs nedikir. Piştî mazûvaniya Vîkî ya maqûl a li gel xwarin û vexwarinên cihêreng, em ber bi şevên San Juanê ve diçin. Li nav bajêr, em li çend clubên bêsinor ên ku kontrol û otokontrol li devê derî tên hiştin digerin. Em li wir baştir fêm dikin ku reqs, parçeyeke hêja ya karaktera Emerîkaya Latîn e. Dawiya şevê, ji ber westan, vexwarin û tesîra jet lagê, em jî nizanin kê em birine û çawa gîhaştine malê.

Rojên din ên li Porto Rîcoyê, di nav xwezayê, li peravê Şinzeryayê, li ser qûma spî û li partiyên malan derbas dibe. Hema her roj em mêvanê malekê ne.

Em biçin kîjan malê li hewşên wan teqez em çend Îguana dibînin. Ev aferîdeyên rengîn lê yên tirsnak, ziravên mirov




diqetînin. Dema em çîroka wan dipirsin ka çima ew çend pir û berbelav in, bersiv me behitî dihêle. Di rastiya xwe de Îguana ne heywaneke Porto Rîcoyî ye, hin kesan çendek ji derve anîne û di nav zemên de jî zêde û berbelav bûne. Ji ber xisara didin xwezayê, dewlet mecbûr maye bi yasayekê wan bi pereyan bide berhevkirin û kuştin.

Di dilê min de mabû, berî roja vegeerê min ji hevalan xwest da bi hev re em biçin wê şalaleya ku pêrgî wê hatibûm. Vê carê ji dewsa kilaşê, soleke girtî di lingên min de bû û em ji riyê gelek rehetir gîhaştibûnê. Bi heman bandorê, di nav wê atmosfera xama û melevaniya di bin ava şalaleya La Minayê de, serdanpê em nû û sermest dibin... Serkan û Sharon jî li wir bi hev didin qebûlkirin ku cografya qedere û hin tişt bi hezkirin û daxwazeke mezin jî naguherin. Dotira rojê dema xatirxwestinê tê. Em ji xweşikahiya xwezaya çewligê û ji dostaniya Sharon, Vîkî, Lydia, Samûel, Ana Teresa, Roberto, Jacqueline, Hernan, Camilet, Glendalys û Umîyê biçûk têr nabin. Riya me ya vegeerê wê ji ser Santo Domingoya Dominican Republic bûya. Ji bo dagirtina rojnivîskan, cihên nû, serguzeşt û mirovên cihêreng li benda me bûn...



WHATSAPPA MEŞHÛRAN

Whatsapp êdî bûye perçeyek ji canê me
û em tim pê emel dikin. Lê gelo rewşa navdaran
a li ser Whatsappê çî ye? Me ji bo we berhev kir.



ZEWAC

NE BI WÊ NE JÎ BÊYÎ WÊ



NAMEYEK JI MÊREKÎ KU HATIYE BERDAN



ZEWAC

Egîd Firat

agometheus0@hotmail.com

Zewac: Riya Feylesofiyê

Berî ku behsa zewacê bikim, dixwazim gotineke Feylesof Sokrates bînim bîra we, dibêje: “Berî ku hûn bizewicin bila çar çavên we hebin lê piştî ku hûn zewicîn çavekî xwe bigrin.” Bi min ev gotin ne zêde kûr û felsefîk e, ji ber ku zewaca camêr jî zêde ne bi dilê wî bûye û tim bi şer û pevçûnê derbas bûye, mirov dikare di derbekê de bibêje ew çavê ku girtiye çavê pevçûn û zordariyên zewacê ne.

Wekî gelek miletan, di nav me Kurdan de jî zewac çandek e û heta roja îro jî didome. Helbet li gorî rewş û guhertinên cîhanê yên teknolojîk an jî civakî em jî digûherin. Heta salên 80/90î jî zewaca Kurdan bi piranî bêyî ku jin û mêr hev bibînin, bi xwezgîniya malbatan pêk dihat û piştî seyrana dawetê cara ewil hev didîtin, êdî ew û şensê xwe...

Xwezgîniyên zewacên Kurdan jî têra xwe ecêb in: gava malbata lawik diçe mala keçikê bo xwezgîniyê, nabêjin em hatine keça we bixwazin ji lawê xwe re! Dibêjin “Em ji bo bibin mirovên hev hatine serdana we.”

Di meseleya zewaca Kurdan de yê herî bêsiûd û bextreş jî nifşê me ye. Bi Tirkî jî vî nifşî re dibêjin “Y Kuşağı”. Ev nifşê belengaz, di navbêra dîroka bav û kalan û nûjeniyên civakê de fetisî ye. Damarekî wan feodal, damarekî wan modern e, damarekî wan bêhnfireh, damarekî wan bêhteng e, damarekî wan pêşverû, damarekî wan paşverû ye. Bi kurtasî em dikarin bibêjin piçek modern, piçek jî feodal... Jinên Kurd jî êdî feyza xwe ji Frîda Kahloyê digrin jixwe, ne bi hişmendî ne jî bi fizîkî serdestiya mêran qebûl nakin, nexasim jinên “xwenda.”

Di esasa xwe de zewac bi tena serê xwe saziyek e. Caran bêyî hemdê xwe jin an jî mêr bi refleksên xetere, bi gotinên şaş an jî bi hêrsbûyînên bêmane tevdiagerin. Zewac hêzek e û pirî caran hikmê xwe li ser fikr û ramanan dike, zewac jî feyza xwe ji rewşên sosyokultûrel û sosyopolîtîk digre û îradeyê nakawt dike.

Tevî hemû pevçûnên beredayî, pirs-girêkên debarê û zehmetiyan dîsa jî zewac, bi hezar salan e hê jî girîngiya xwe diparêze û wisa dixuye ew ê wisa bi-dome jî. Helbet xweşiyên zewacê jî hene lê jiyan û xweza ti tiştî bê berdêl nade mirov. Her çi qas mirov pê haydar nebe jî jiyan, hemû tolên xweşkêliyan ji mirov distîne. Çawa? Mesela xweştirîn kêf ew e ku dema mirov bû xwedan zarok û bi zarokên xwe şa dibê. Lê dema ew zarok nexweş ket an jî tiştê hat serî jî, bi heman hestên berevajî mirov pê diêşe. Ê jixwe jiyan jî bi serê xwe wisa ye, ev yek dike ku mirov bi cesaret tevbigere.

Zewac heyat e hevalno teqez bizewicin, ma ne jixwe Sokrates piştî zewicî bû Feylesof! her wekî ku Sokrates jî gotiye: “Bizewicin, teqez bizewicin! Ger ku jina we baş be, ji we bextewartir wê tune be, ger ku ne baş be jî hûn ê bibin feylesof.”

Ez bûm feylesofekî qerase, aqûbet ne li serê we..

NAMEYEK JI XORTEKÎ JI ZÛ VE YE BERZEWAC



ZEWAC

Recep Çiçek

recep--cicek@hotmail.com

**“Ez qurbana wan çavên te,
Çi zalim in dê û bavê te...”**

Merheba. Ez xortekî ji zû ve ye berzewac im...

Êdî bûme pisporê xwezgîniyê, çimkî 8 sal in ez diçim xwezgîniyê lê ji ber ku em gundî ne, dayikên keçikan her car devê xwe xwar dikin û dibêjin “em keça xwe nadin gund!”

Bila şaş neyê fêmkirin! Keçên ku me ew xwestin gişkî jî gundî bûn..

Berê ne wekî niha bû, edetên me yê xweş hebûn. Tê bîra min berê malbata lêwîk gava diçû xwezgîniyê, ger malbata keçikê nexwesta keça xwe bide, digot “welleh me ji we pir hez kir, pir xwîna me li we keliya lê pismamê keçikê gotiye eger hûn dotmama min bidin xelkê; El-lahwekîl ez ê ji qatê pêncan xwe biavêjim xwarê!! (bêlome be!)”

Çi edetêke xweş e. Aniha 8 sal in ez diçim xwezgîniyê lê bes carekê jî min ew pismamên ku ji bo dotmama xwe, xwe dikuştin nedîtin. Zeman xerab e malbata keçikê eynî rasterast dibêjin “Bajar e an gund e? Keça me ji gund re nabe, em keça xwe nadin gund...”

Berê telefon, înternet, Facebook, Whatsapp filan tune bûn. yanî xwezgîniyên berê jî tîna bîra min. Ji ber ku ew teknoloji tune bû, li Rihayê malbata keçikê zava dixapand. Gava Rihayî diçûn xwezgîniyê, malbata keçikê tepsiya qehwê dida destê keça xwe ya çeleng a bejnzirav û gulîzer ku tu dibêji qey Xwedê te’ala bi birincî kalîte malzeme çêkiriye û ew dişand hundir. Xort û malbata reben jî ew didît û dixwestin. Ji ber ku berê edeta “dergîst naçe mala dergîstê” hebû, heta dawetê hevûdu nedidîtin. Ma berê înternet hebû?! Roja dawetê jî malbata keçikê, qîza xwe ya reş, qelew û serxorim a ku Xwedê te’ala esas tew mesref lê nekiriye, bûkanî lê dikirin, dixemilandin û ji zavayê reben re dişandin. Keça dimaldemayî, bi vê zilmê dikirin bûk. Jixwe eger ew bûk vegerandana jî îcar bi tonan xwîn dirijiya. Ez bi vê edeta zalim jî razî me heyran! Mala xwezûrê min mala mêran e. Bila keç be bes e. Ew losa zava-xapandinê jî ji xwezûrê hezretê Yaqûb maye. Ewil wî keça xwe ya dimaldemayî, bi vî awayî daye hezretê Yaqûbê reben. Yanî em Rihayî mirovên dilpak û dilnizmin, em ji Benî-Îsraîlê fêrî vê zilmê bûn.

Ez 23 salî bûm, cara ewil min ji keçekê hez kir û min got “ji min re bixwazin!”

Bavê min got “Ez wê naxwazim; ew keçik ji me re nabe, yeka ‘bicisn’ bibîne!”

Min xwe bi xwe got; gelo keçên bicisn çawa belî dibin? Gelo ma ev meza-ta Sêwregê ye ku ez dê herim çêlekeke Sîmental bikirim?

Ez çûm dawetekê da ku keçeke bicisn

bibînîm û bizewicim. Min bala xwe da keçikan. Welleh qoçên ti keçikan jî tune bû ku bibêjim “aha ev bicisn e.” Giş bi 2 ling, 2 mil, 2 çav û 2 poz bûn, heta pêçiyên destan jî 5+5 bûn. Min dev ji zewacê berda; çimkî ez ji jiyana xwe sar bûm Ellahwekîl. Jin jin e; bicisn kî ye?...

Piştî vê meselê min dev ji evîne berda û min fêma kir ku zarokên malbatên feodal, nikarin bi evîndara xwe re bizewicin, encax dikarin li gorî dil û fikrên malbata xwe bizewicin.

Yê keçikan çawa dibe nizanîm lê gava xortek di mal de dimîne, qey tu dibê ka Cebrail aleyhîssalam bi emrê Xwedê te’ala hatiye û ji wan re gotiye “zû vî xortî bizewicîn!” Apên wî, xalên wî, met, xaltî, pismam, kurxal, bixaltî, cîran û heta xwîniyên wî yên ku ji bo perçeyek erd ji hevdu mêr kuştine jî, çawa xortê dimaldemayî dibînin devê xwe vedikin û dest pê dikin: “Law min ji te re keçek dît ûfff! Min ji te re keçek dît ebooww! Min ji te re keçek dît tew tune tune! Min ji te re keçek dît law peeh çî keçik e çî keçik!...” Belê ev 8 sal in kê ji min re got min ji te re keçek dît! Min dilê wî li xwe nehişt, min çû xwest lê qey ne qedera Rebbil alemîn bû; wan jî keça xwe neda gund û em jî hatin mala xwe. Gotineke pêşiyana heye: Yê ku biçe xwezgîniyê yan dê tûrekî zêrê xwe hebe, yan jî tûrekî derewên xwe.

Wellehî ne tûrekî zêrê me hebû ne jî me dizanibû derew bikira.

Ez bi meselokekê vê mijarê bigihînim serî;

Rojek ji rojan, li Rihayê kamyonvanek diçe gundê Badiliyan ku genim bar bike. Kamyonvan li odeya muxtêr, li gel çend gundiyan rûdine. Wexta nimêjê, mela bang dide, kamyonvan û gundî radibin ku nimêj bikin. Ji gundiyan yek berê xwe dide Hewagê, yek berê xwe dide Wêranşarê, yek berê xwe dide Sêwregê, yek jî berê xwe dide Sirûcê û dest bi nimêjê dikin. Kamyonvanê reben şaş dibe ku qîble li kîjan alî ye. Dibêje “Muxtar evên hanê çî dikin? Qibleya we çawa ye?”

Muxtar dibêje “Jina te xelkê ku derê ye?”

Kamyonvan dibêje “Jina min xelkê Xelfetiyê ye”

Muxtar bi destên xwe aliyê Xelfetiyê nîşan dide û dibêje “ee welleh kamyonvano qîbleya te jî aha wisa ye. De tu jî dest bi secdê bike...”

Me 23 rojan berî vê dîsa keçek xwest. Mizgîna min li min be, malbata keçikê negot em keça xwe nadin. Lê negot em keça xwe didin jî. Hêj tiştê negotine Ellahwekîl. Ez dibêjim qey ji bîr kirin ku me keça wan xwest! Belkî wan keça xwe bida lê wan jî ji bîr kir. Eger keça xwe bidin min, pê neqêherin lê piştî ewqas zilm û zordarî êdî qîbleya min jî mala xwezûrê min e...



Derhênerên Kurd dipeyivin

GIRİZGAH

Behmen Qubadî yek ji derhênerên herî baş ên sînemaya Kurdî ye û dengê Sînemaya Kurdî li cîhanê belav kiriye/dike. Qubadî li ser serpêhatiya xwe ya sînemayê dibêje “Tiştê sereke ku ez kirim derhêner û rê nîşanî min da, kurtefilmên ku min çêkirin in.”

Îro-roj gelek derhênerên ciwan ên Kurd jî barê sînemaya Kurdî hildane ser milên xwe û bi kurtefilmên xwe derdikevin hafa me. Hêviya temaşevanên sînemaya Kurdî jî wan gelek e.

POPKURD'ê pirsî, wan jî cewab da. Kerem bikin derhênerên kurtefilmên Kurdî nas bikin û guh bidin wan.

PIRSÊN BO DERHÊNERAN

1. Bi ya te problem an kêmasiya herî serke ya sînemaya Kurdî çi ye?
2. Elaqeya temaşevanan bi dilê te ye an na? Li ser temaşevanên sînemaya Kurdî tu yê çi bibêjî?
3. Te dil heye filmeke metraj-dirêj bikşînî? Ji bo vê îmkan hene?
4. Mottoyeke sînemaya te heye an na?
5. Tu dikarî navê filmekê bêjî ku xwînerên PopKurdê divê îlleh temaşê bikin?





BERSIVÊN PIRSAN

1. Ji bo ez vê bersivê bidim divê haya min baş ji sînemaya Kurdî hebe. Lê ji ber em nikarin xwe bigihînin hemû filman em ê nikaribin rexneyeke baş jî li ser sînemaya Kurdî bikin. Lê li ser berhemên ku min temaşê kirine ez bêjim; bi taybetî bikaranîna zimên a xirab min gelek aciz dike. Lîstikvanên ku qet Kurdî nizanin, tenê tekstê ji ber dikin û bi zimanekî xirab karakterên Kurdî dilîzin, ne mimkun e e em ji wan karakteran bawer bikin lê ji xwe hinek derhêner ne ji bo me wan filman çêdikin. Belkî ne neheq bin jî, ji ber ku li Kurdistanê cihên ku filmên Kurdî bigihîje temaşevanan an tune ne, yan jî gelek kêman in. Li Başûr her çiqas sîstemeke kurdî ava bûbe jî hewldanek netewî ya hunerî kêman e. Ne salon ne jî TV, filmên Kurdî yan nîşan nadin an gelek kêman û lokal in. Sînemagerên Kurd her çiqas hunera kurdî dikin jî têkiliya wan bi beşên hunerê yên wekî edebiyata Kurdî zehf kêman e. Lê em realîteya welêt bidin ber çavê xwe, gava em him zexta li ser civakê ya dagirkerî him jî nebûna polîtîkayeke hunerî ya kurdî binêrin, dîsa ji berhemên bi hejmar kêman lê bi naverok xurt derdikevin. Her wiha mirov nikare wek sînemaya cîhanê, bi dilekî rihet sînemaya Kurdî rexne bike, ji ber ku

ARAM DILDAR

Di sala 1990an de li Batmanê hat dinê. Li zanîngeha Marmarayê beşa Sînemayê xwend. Di karên TVyan de derhênerî û alîkariya derhênerîyê kir. Derhêneriya bernameya “Kurd Îdol Ekstra”yê kir. Di hin filman de lîst. Bi navê “Binevş”, “Tixubên Nepenî”, “Da” û “Haziriyek bo Derengmayînê” 4 kurtefilm kişandin.

her problem, sebabên xwe yên dîrokî jî hene. Nebûna azadiyê, sebabê sebaran e.

2. Ji ber ku cihên temaşevan û film bîncem hev kêman in û li dehan bajarên Kurdistan salonên sînemayê nîn in, em nikarin vê bersivê bidin. Di festîvalan de ne xirab e. Ew jî ne îstatîstîkeke baş e. Filmeke Kurdî ku bikaribe bala temaşevanan bixşîne, bê kişandin û li hemû bajarên Kurdistan bê nişandan, em ê wê çaxê fêman bikin.

3. Erê çend fikrên min jî hene, lê nizanîm îmkan wê hebe an na. Li gorî min ewil divê ez amade bim, gava bixwazim tiştekî bikim li imkanan mêze nakim, dibe ku ez qet nikaribim bixşînim jî lê lazim e ewil senaryoyeke baş di destê min de hebe. Divê ewil ez amade bim, ew fikr kelecaneke wisa bide min ku, bikaribim wî barê giran bidim ser milê xwe û bi riyekê wan îmkanên maddî peyda bikim. Lê ji bo hizreke baş, pêwistiya min tenê bi nêrîneke baş a hunerî heye; ew jî eleqeya wê bi pereyan nîn e. Dibe ku ez ne derhênerê baş bim, wê gavê îmkan hebe çi ye nebe çi ye?

4. Mottoyeke min nîn e.

5. Xweşî û delalî, heqîqet ne li cihekî tenê ye, divê mirov bigere wekî mêşhingivê.



BÊRSIVÊN PIRSAN

1. Bazara sînemaya kurdî kêr e, ji bo nimune; Tu heta bêjî bes filmeke baş çê-bike (yên ku çêdikin jî têra xwe hene) ji bo ku tu vê filmê bidî temaşekirin, ji bilî çend festîvalan tu cih tune ne. Yeke din jî film-maker, kesê/a ku filmê çêdike (Çêker) li cem me derhêner in. Ya rastî hemû bar li ser piştê derhêner e. Divê em dabeşkerin û pênasakirina rolên pêwîst baş bikin ku herkes karibe di karê xwe de bibe pispor.
2. Li ser pirsê we min hesabê xwe yê Youtubeyê kontrol kir: 151 Şopînerên min hene û filma ku min herî dawî kişandiye (Du Raport bo Akademiyê) 210 kesan temaşe kiriye. Min ev film ji bo festîvalan neşandibû, rasterast li ser Youtubeyê bar kiribû.
3. Dil dixwaze helbet lê ya dila nayê mila. Ez van rojan li ser senaryoyekê dixebitim, çawa biqede ez ê dest bi kêşane bikim. Ji bo îmkanan naxwazim gazinan bikim. Projeyên baş, îmkânên xwe jî bi xwe re tînin.
4. Ya rastî hê jî min mottoyeke jiyane ji xwe re nedîtiye ku ew bandoreke li sînema-

BÎLAL KORKUT

Ji sala 2016an ve li Zanîngeha Mimar Sinanê beşa Sînemayê dixwîne. Filma wî ya yekemîn 'Ez Tusubasa Me' gelek xelat girtin. Niha hewl dide ku li ser kanala xwe ya Youtubeyê kurtefilmên xwe, programên danasîna kitêban û bernameyeke gerê bar bike.

ya min jî bike. Lêgerin berdewam e, pêşî ji bo min pişt re ji bo karê ku ez dikim.

5. Filma Abbas Kiarustemî "Khaneye Doust Kodjast" (Mala Hevalê Min li Kû ye?)





ÇETİN BASKIN

Di sala 1983yan de li Diyarbekirê çêbû. Li Zanîngeha Dîcleyê Mamostetiya Biyolojîyê xwend. Dû re li Zanîngeha Bilgiyê di beşa Radyo û TV'yê de lîsansa bilind kir. Kurtefilmeke bi navê "Geriyayîş" kişand ku film bi Kurdiya Zazakî ye.

BERSIVÊN PIRSAN

1. Nizanim mirov dikare behsa sînemaya Kurdî ya komplîke bike, dudil im. Ev mijareke din e ku divê bê zelalkirin. Gelo îmajeke sînemaya Kurdî heye ku em çawa bibînin wê nas bikin û bibêjin "ev, sînemaya Kurdî ye." Dema me ev mesele piştrast kir, dû re em dikarin li ser probleman biseknin.

2. Bi ya min asta temaşevanên filmên Kurdî gelek bilind e. Her tiştî krîtîk dikin û bi çavekî analîtîk sêr dikin.

3). Helbet, ger şert û merc çêbin ez dixwazim filmeke metraj-dirêj bikêşim. Vêga îmkaneke wisa tune ye.

4. Mottoyeke min nîn e lê ez bi vê hisiyatê filmê dikêşim; dema ez temaşe dikim, ez dinêrim bê ka gelo ez li hemberî xwe durist im an na? Heke ev film kesekî din kişandiba min ê bicibanda an na?

5. Ne yek film lê sêbareya "Koker"ê ya Abbas Kiarustemî (Mala Hevalê Min li Kû Ye?, Ê jîyan berdewam e, Li bin Darên Zeytûnan) peşniyaz dikim.





BERSIVÊN PIRSAN

1. Ji bo min sînema, çîrokbêjî ye. Lê mixabin ez dibînim ku di sînemaya Kurdî de dîdaktîzm û oryantalîzm li pêş in. Ev “dersdayîn” rê li ber çîrokbêjîyê digire.

2. Ez temaşevanên Kurdî gelek diecibînim. Tevî ku filmên Kurdî li kêm cihan tên nîşandan jî elaqe gelek e. Ji bo em xwe bigihînin bêhtir temaşevanan, lazim e em alternatîfan çêkin.

3. Belê niha projeyeke me ya bi nave “Pîrebok” heye. Fîlmeke metraj-dirêj e û senaryoya wê temam e. Di Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Enqerê de ji bo “Pêşvebirina Projeyên Metraj-dirêj” hat hibijartin. Ez niha haziriyam dikim. Her kî bixwaze di nav projê de cih bigre an alîkariyê bike, deriyê me her ji wan re vekirî ye.

4. “Kubrick dibêje “Heke tiştek bê fikirin an nivîsandin, helbet fîlma wê jî dikare bê kişandin.


5. Naxwe ez ji sînemaya Kurdî 2 fîlman peşniyaz bikim. Yek kurtefilm e, yek metraj-dirêj.

-Kurtefilma “Geriyayîş” a Çetin Baskın

-Fîlma “Beriya Şevê” ya Ali Kemal Çınar

LÜTFÜ İRDEM

Lütfü İrdem, di sala 1986an de li Siwêregê hat dinyayê û niha li Diyarbekirê dijî. Di hin filman de lîstikvanî kir. Bi navê “Fotografkêş” û “Ceniya Nêeysayî” du kurtefilmên wî hene.





BERSIVÊN PIRSAN

1. Berî ku em behsa kêmasî û pirsgirêkên sînemaya Kurdî bikin divê em li ser cihê wê hûr bibin. Sînema ji bo Kurdan hunereke nû ye. Kurd her çiqas di dîroka sînemayê de di serê sedsala 20an de hatibin xuyakirin jî; weke hilberîner, çêker û afirînerên di vê hunerê de, van demên dawiyê bi pêş ketine. Bê guman sedema vê ya herî mezin bêdewletbûna Kurdan e. Bi vê yekê re têkildar; Kurd di bin desthilatdariya dewletên din de, nebûne xwedî statuyeye fermî, bi ziman û çanda xwe perwerde nedîtine; zimaneke hevpar, rengêkî xweser û sekneke hunerî neafirandine. Ji xeynî van; bi taybetî şerên ku ev serê 150 salên dawî li Rojhilata Navîn diqewimin, bandorên gelekî mezin ên xirab li ser gelê Kurd çêkirine. Vê rewşê him li ser hilberîna gelê Kurd a hunera sînemayê bandorên nebaş kirine û him jî mijara qadên hunerî li ber derhêner û çêkerên Kurd ên sînemayê teng kiriye.

2. Ya rastî ez nizamî çiqasî pêkan e ku ez behsa girseyeke temaşevanan a Kurtefilmên Kurdî bikim. Li gelek warên cihanê û welatê me kesên ku kurtefilman çêdikin, filmên xwe bêhtir bi riya festîvalan an jî qadên wekî YouTube û Vimeoyê digihînin

ROZA ERÎZÎN

Li Erzînganê ji dayik bû. Di sala 2007an de li Zanîngeha Marmarayê bêşa PDR'ê qedand. Di navbera salên 2010 û 2012an de, li Konservatuara Aram Tigran a li Amedê perwerdeya sînemayê dît. Kurtefilmên wê: Defter, Bayêkûr, Dara Gûzê û Paceyek.

temaşevanên xwe. Zehmet e ku mirov bi gelemperî behsa asta baldariya temaşevanan bike. Çimkî festîvalên ku filmên Kurdî nîşan didin gelekî hindik in. Ger ku festîvalên netewî bi rêk û pêk werin çêkirin û hêjmara wan zêde bin bawer im ev yek wê bandoreke baş li ser bala temaşevanan bike.

3. Belê heye. Wekî ku hûn dizanin sînema ne hunereke erzan e. Ji bo ku filmeke baş çêbibe ji bilî fikreke baş, şiyar û xebateke xurt; tîmeke çeleng, amûr û pere jî hewce ne. Niha di destê min de tenê alîkariya derdora min heye. Ji bo derfetên baştir divê mirov bikeve nava hewldanan.

4. Kamerayê me heye û rêhevaltiyê me.

5. Bê Deng / Rezzan Yeşilbaş an jî Haziriyek bo Derengmayinê / Aram Dildar.





SELİM AKGÜL

Di sala 1982an li Midyadê Xwedê ew da. Li Zanîngeha Mustafa Kemalê ya Hatayê Karîgerî-îşletme xwend. Bi navê “Rojek”, “Mêrên ji Avê Ditirsin” û “Scud-Patriot” 3 Kurtefilm kişandin.

BERSIVÊN PIRSAN

1. Pirsgirêka herî mezin a Filmên Kurdî ew e ku film ji bo temaşevanên Kurd nayên çêkirin.

2. Filmên Kurdî li festîvalan elaqe dibînin û xelatan distînin, piştî festîvalan jî li hin sînemayan dikevin vîzyonê. Wekî filmên din ên festîvalan ew jî zêde nayên temaşekirin. Em nikarin vê meselê jî bixin stûye temaşevanên Kurd. Çimkî wekî min got; ji xwe ne ji bo temaşevanên Kurd tîn çêkirin.

3. Belê min dil heye helbet. Ez dixwazim bi serê xwe û bi perê xwe çêkim. Ji bo vê niha derfet têrê nake.

4. Na tune ye.

5. Kêfa min ji filmên Tarantino û Coen Brothers re tê. Dikarin li hemûyan temaşebikin.





BERSIVÊN PIRSAN

1-2. (Her du pirsên ewil bi hev girêdayî ne loma ji bo herduyan ez ê bersivekê bêjim)

Ne wekî problem, lê em bêjin kêmasiyeke di derheqê lîstikvanan de heye. Di filmên Kurdî de rûyên cûda, çi jin çi mêr, lîstikvan kêmin û di gelek filman de heman kesên ku tên zanîn hene. Gerek derhêner, bi lîstikvanên cûda re jî bixebitin. Di filmên Kurdî de problema senaryoyan jî heye. Bingeha piraniya filman drama ye û ji hevdû ne gelek dûr in. Ji aliyê senaryoyê ve mijar an qels dimîne yan jî her tişt tê de zêde eşkere ye. Çîrokên baş hene lê belê lazim e bi senaryoyên baş bînin honandin. Yanî bi ya min; problema mezin ne



TAHSÎN ÖZMEN

Li Cizîrê hat dinyayê. 10 sal in bi sînemayê re mijûl e. 2 kurtefilm kişandin ("Mast"-2015 û "Pantor"-2018).

pere û piştgirî ye. Heger tu çîrokê baş, spehî û li gorî pîvanên senaryoyê binivîstî û baş bikşînî, wê demê kamerayeke biçûk jî, ekîbeke biçûk jî hebe, wê bes be ji bo filmeke baş. Wê demê temaşevan jî wê ji filmê hez bikin û elaqe wê zêdetir be. Ji ber ku temaşevanên sînemaya Kurdî, sînemaya Cîhanê jî dişopînin û dizanin. Fîlmek baş e an xirab e, fêmkirin.

Elaqeya temaşevanan ne xirab e.

3 Ez niha senaryoya filmeke dirêj dinivîsim. Dema min derfet dît ez ê bikşînim.

4. Ji bo min di sînemayê de motto ne muhîm in.

5. Filma derhêner Slobodan Sijan, "Ko To Tamo Peva"





VEDAT OYAN

Di sala 1993an de li Farqînê hat dinyayê. Li Zanîgehên Fîrat û Akdenizê beşa Radyo û Televîzyonê xwend. Bi navê “Mavera” (2016) kurtefilmek kişandiye.

BERSIVÊN PIRSAN

1. Problema herî sereke ew e ku piştgiya çêkeriya filman tune ye. Derhênerên Kurd di meseleya budceyê de gelek zehmetiyan dibînin. Ne dewlet ne jî kes an saziyên çandî destekê nadin filmên Kurdî an ên li ser Kurdan. Bêdewletî problema sereke ye.

Wekî din derhênerên Kurd ji çanda xwe dûr in. Sînemagerên Kurd lazim e xwedî li tradîsyona hezarsalî ya Kurdî derkevin da ku berhemên baş derkevin. Encax bi vî awayî em dikarin sînemaya Kurdî li cîhanê bilind bikin.

Problemeke din jî ew e ku çêkerên filmên Kurdî ji hev dûr in û bi hev re kar nakin. Gelek çêker jî bi çavekî oryantalist li Kurdan dinêrin û bi vî awayî dixwazin tevî festîvalên Tirkan bibin. Tabî ev ne tenê bela derhêner e. Problemên siyasî û dûrbûna ji welêt jî, di vê meseleyê de astengiyan çêdikin.

Yek ji kêmasiya mezin jî nebûn an jî hindikbûna salonên sînemayê ne.

2. Temaşevên Kurd zêde elaqe bi festîvalên li Kurdistanê nakin. Helbet ev jî dilê me diêşîne. Bala temaşevên Kurd

zêde ne li ser filmên hunerî ye. Ev heta radyekê normal e jî. Di vir de mesûliyeta me sînemageran jî heye. Lazim e em tiştên baş çêkin û deynin ber gelê xwe û gel jî bala xwe bide ser karê me.

3. Helbet wekî gelek sînemageran ez jî dixwazim filmekî metraj-dirêj bikşînim. Li welatê me gelek çîrok hene ku li benda vegotinê ne. Niha ji bo vê îmkana tune ne lê ez ne bê hêvî me.

4. Divê em strana welatê xwe bêjin. Heke em bixebitin em ê bi ser kevin.

5. Gelek film hene lê ez dixwazim filma Şewket Emîn Korkî ya bi navê “Bîranînên li Ser Kevir” sêr bikin. Ew ê di wir de bibînin bê ka derhênerên Kurd di çî zehmetiyan de karên xwe dikin.



CÎGERA DIYARBEKIRÊ Û ÇEND MEKAN



NOŞÎCAN BE!

Neşet Girasun

av.nesetgirasun@hotmail.com

Ibn-i Haldûnê ku di sedsala 14emîn de li Efrîqaya Bakur jiyaye û Montesquieuyê ku 200 sal berê li Fransayê jiyana xwe domandiye, tezeke muhîm parastine. Li gorî vê tezê; coxrafya, xweza û îklim, rasterast tesîrê li ser jiyana însanan û civakê dikin. Her wiha têkiliya van faktorên bi sîstema polîtîk, çanda demokrasîyê û jiyana dînî re jî heye.


Bi ya min ev faktor bandoreke xurt li ser çanda me ya xwarinê jî dikin.

Li ser meselê; li welatên Behra Spî (Fransa, Spanya) hewa piranî sayî ye û rojên bitav gelek in. Dema em van welatan bi welatên Bakur (Danîmarka, Swêd) ên ku dinya piranî ewr û baran e re miqayese dikin, em dibînin ku mitfexa welatên Behra Spî dewlemendtir e. Herwiha li vê herêmê xwarin-vexwarin di jiyana însanan de xwedî cihekî taybet e.

Gava em bajarê Bakurê Kurdistanê didin ber hev jî em dîsa vê ferqê dibînin. Diyarbekir, Riha, Entab, Mêrdîn û Cizîr li gorî Dêrsim, Colemêrg û bajarên Serhedê germtir in. Herwiha li van bajarên germ, çanda xwarinê dewlemendtir e. Li herêmên çiya û serma, heyat ji ber şert û mercên coxrafîk, zehmettir e. Lewma mirov dikare beje ku li van deveran, însanan bi mişkuleyên dîtir û “muhimtir” re mijûl in. Ew “luks” a wan tune ye ku serê xwe bi cureyên xwarinê re biêşînin.

Li aliyê din dema em li bajarên germ mêze dikin, li wan deran peydekirina pêdiviyên sereke û zarûrî hêsantir e. Vê jî hiştiye ku xelk bi karên “fizûlî” re mijûl bibin. Loma însanan li van deveran li ser xwarinan hûr bûne û tehmên cuda ji mitfexên wan derketine.

Bo nimûne; mitfexa Diyarbekirê têra xwe dewlemend e. Hin xwarin û şêraniyên Diyarbekir ev in; Cîger, Lehmecûn, Parsûyên



Dagirtî (Kaburga Dolması) Meftûne,
Serûpê, Qedayîf (Burma), Kunefe...

Lazim e em vê jî bibêjin ku gelek tehm û xwarinên bajêr hene ku xelkê derveyî Diyarbekirê hêj ew keşf nekirine.

Ka em bèn ser meseleya Cîgerê. Hûn dizanin Diyarbekirî û Rihayî di vê behsê de qet li hev nakin. Her du jî îdia dikin welatê sereke yê Cîgerê bajarê wan e. Ez dixwazim li vir ji bo xwînerên POPKURDê îstatîstîkeke balkêş bêjim; Rêjeya Cîgera ku li Diyarbekir û Rihayê tê xwarin, ji temamiya 79 bajarên din ên Tirkîyê zêdetir e.

Cîger, li Diyarbekirê bi tena sere xwe kulturek e. Li seranserê bajêr, hûr û gir, bi dehan “Cîgercî” hene. Lê hema beje hemû, ji aliyê beharê, xizmet, serwîs û hwd. ji hev cuda ne.

Ez ê ji van “Cîgercî”yan tenê 3 liban bi we bidim nasîn ku bi min, mekanên xweser in.

Yê yekem “Tokay Ciğer Salonu/Ciğerci Hasan Usta” ye. Li Kolana Hunerê ya Ofîsê ye. Mekan ji 6 û nivê sibê heta esirkî saet 4an vekirî ye. Lê hin caran ji ber ku cîgerên wî xilas dibin, zûtir tê girtin. Li wir, ewilî cîger ji sinêran tê safîkirin. Dû re cîger bi xwê û îsota sor a toz tê terbiyekirin. Libên cîgerên vir orte ne.(piçek ji yê Rihayê mezintir)

Ez bawer im ji ber çêkirin û tezebûna wê ye, tu ji porsiyonekê pirtir bixwî jî pê aciz nabî. Li ber cîger tenê îsota biraştî, firingiyên zûlîkirî û pîvaz heye. Ji xwe ji bilî vê, heke li ber cîger selate felan bê servîskirin, nahêle mirov ji cîgerê têr tehmê bistîne. Roja ku cîgera teze peyde neke, mekan wê rojê girtî ye. Tenê ev hesasiyeta Hesên Usta jî nîşaneyê bo tehm û çêja cîgera wî.

Yê duduyan “Ciğerci Zeki Usta” ye. Ji ber ku li kuçeya postaxanê ye, Diyarbekirî jê re dibêjin “Postane Ciğercisi.” Li vir cîger an li ser maseyên biçûk an jî li ser piyan tê xwarin. Li hemberî wê qehwexaneyek heye, heçiyê bixwaze, dikare li wir jî bixwe. Mekan di navbera şevqê saet 6an û şevê saet

10an de vekirî ye(herî dereng). Li gorî “Tokay Ciğer Salonu”yê, libên cîgeran li vir girtir in. Di cîgerê de wek beharê li vir jî xwê û îsota sor a toz heye lê dema mirov tehm dike, dibêje qey cudatir e. Hênika hiya sibe hê, manzereya sûran, sadebûna dezgeyê û tehma cîgerê, ahengeke pir xweş çêdikin û bêhna mirov li vir derdikeve. Nanê pîde(Açık Ekmek) yê Diyarbekirê bi cîgera vir re pir xweş diçe. Li mekanên din pîranî nanê lawaş heye.

Herî dawî jî dixwazim behsa “Dağkapi Ciğercisi/Ciğerci Hüseyin Usta” bikim. Mekan li meydana Dağkapiyê ye. Mezintirîn û qelebalixtirîn mekanê Diyarbekirê ye. Saet ji 7ê sibê heta 3yê şevê vekirî ye. Lê ez bi pîranî şevê saet di navbera 10 û 3yan de diçim wir. Çimkî van saetan him qelebalixa mekan kêr dibe him jî hosteyê ser mangalê diguhere. Cîgera vir jî bi xwê û îsota sor a toz tê çêkirin. Divê mirov bixe nav nanê lawaş, îsota biraştî, firingiyên zûlîkirî û pîvaz tevî bike û bixwe. Heke hûn li ser piyan, li gel civata hosteyê ber mangalê duruma xwe bixwin, hîn bitehmtir dibe.

Not: Ji sala 1995an heta 2015an, 20 salan min hertim li cem “Xale Miheme” cîger dixwar. Cîgera wî bêhempa bû. Lê mixabin ev 4 sal in tehma wê ya berê tune ye. Sedema wê jî bi min; mezinbûn û populerbûna mekan e.



MIHEMED ŞÊXO

“Ez zanîm hûn bêriya min dikin...”

Di sala 1948an de li “Qamişloka Evînê” hat dinyayê. Hewce nake em behsa şert û mercên dijwar ên zarokatiya wî bêjin.

Mihemed Şêxo, ji muzîkê pir hez dikir lê li Sûriyê îmkanên wî tune bûn. Berê xwe da Lubnanê. Li wir, li gel hevalên xwe komeke muzîkê ava kir. Navê komê “serkeftin” bû. Kasete wî ya ewil “Ay Gewrê” bû ku xortên Kurdan hê jî bi wan stranên bi cizbê dikevin...

Bi temamî 14 kaset derxistin, li Iraq û Îranê ma, gelek te’be û zehmetî dîtin. Di Adara 1989an de wefat kir. 70 hezar kes hatin ser cinazê wî.

Mezin bû Mihemed Şêxo, pir mezin.



EZ XEM, “XEM”XURÊ RAPA KURDÎ

Ez Xem, ji Batmanê me. Ji zarokatiya xwe heta niha evîndarê muzîkê me. Heta 10 saliya xwe, bi muzîka Kurdî û dû re jî bi muzîkên biyanî mezin bûm. Min di sala 2010an de dest bi rapa Kurdî kir û heta 2015an berdewam kir. Piştî navbera 3 salan, min bi kompaniya muzîkê Red Music dijitalê re peyman danî û bi awayekî profesyonel, di sersala 2019an de albûma xwe ya yekem ‘Biyar’ çêkir. Albûm li ser hemû platformên dijital ên muzîkê heye.



RAPA KURDÎ

XEM

xem.contact@gmail.com



Êdî Dîwar Di Navbera Tarzên Mûzîkê De Nemaye

Li pêşiya min 2 albûmên nû hene ku ji bo tomarkirinê amade ne. Ez xwe tene wekî rapbêjekî nabînim. Ez bi lêkolînerî soundên cîhanê dişopînim û dibînim ku; êdî dîwar di navbera tarzên mûzîkê de nemaye. Tevlîhevkirina şeweyan, riyekê vedike ku muzîkên xweser bîn çêkin. Armanca min ev e ku ez şeweyên wekî House, Pop, Reggae, R&B, Rockê tevlî rapê bikim, şeweyên nûjen ên wekî Trap, Cloud rap, AfroTrap, Dancehall, Reggaetonê jî biceribînim.

Wekî mînak di albûma min a 'Biyar' de hûn dikarin gelek şeweyan bibînin. Strana Newroz: Rap, R&B, House û Pop e. Strana Biyar: Rap, Afro-trap û R&B ye. Strana Payîzê: Rap, R&B û Raggae ye.

Bi kurtasî ez dixwazim her cuda bim, ji klîşeyan dûr bimînim, standart nemînim, xwe dubare nekim û tiştên modern biceribînim.

"Hip-Hop" Çanda Bindestan E,

Di sala 1970an de li Emerîkayê rewşa mirovên reşik pir dijwar bû. Mirovên reşik ji bo ku xwe ji derdên jiyane dûr bixin, ji xwe re çandekê nû afirandin, navê wê çandê kirin "Hip-Hop". Hip-Hop, bûbû çanda bindestan. Ger em "Hip-Hop"ê wekî darekê bifikirin, di nava çanda Hip-Hopê de 4 şax hene; muzîka rap, hunera grafitiyê, Breakdance û dj. Di derbarê muzîka rapê de 3 tiştên gotin. 1: Rhythm And Poem (Rîtm û Helbest), 2: Rhythmic African Poetry (Helbesta Efrîqayîyan a bi Rîtm), 3: Di zimanê

Îngilîzî de tê meneya 'rexnekirina dijwar'. Wekî ku min got "Hip-Hop" çanda bindestan e, lê bi taybetî muzîka rap dengê serhildana bindestan e. Lê îro çanda Hip-Hopê û muzîka rap populer bûye û li her dera cîhanê belav bûye.

Yekem Rapbêjê Kurd, Azad e

Em dikarin wekî destpêka rapa Kurdî strana Azad qebûl bikin. Azad, stran di sala 1994an de, li Elmanyayê bi Soranî gotiye. Azad niha 45 salî ye, bi eslê xwe ji Rojhilatê Kurdistanê ye û li Elmanyayê dijî. Ew li Elmanyayê yek ji rapbêjên herî mezin, navdar û kevnar tê qebûlkin.

Piştî Azad hin rapper û komên rapperên Kurd jî bi zimanê Kurdî stran çêkin lê em dikarin bibêjin ku di sala 2005an de Serhaddo deriyê rapa Kurdî bi awayekî profesyonel vekir.

Li her çar perçeyên Kurdistanê û li dîasporayê gelek rapper hene ku bi zimanê Kurdî rap distrên. Wekî din li dîasporayê rapperên ku bi eslê xwe Kurd in lê bi zimanê biyanî rap distrên jî gelek in. Mînak; di piyasaya rapa Elmanya de Kurd serdest in.





Rapa Kurdî Hêj Di Asta Destpêkê de ye

Li gorî min em hê jî di asta destpêkê de ne. Mixabin platformên me tune ne, çalakiyên xwe em bi xwe organîze dikin û gelekî kêr çêdibin. Me muzîka rapê bi gele xwe nedaye hezkirin. Bi awayekî fermî li ser platformên muzîkê rapbêjên Kurd gelekî kêr in, ji ber ku an wekî amator xebatên xwe dikin an jî bi kompaniyên muzîkan re nikarin peyman deynin. Hejmarên rapperên Kurd jî gelekî kêr in, mînak li Bakur ji 10 kesan bêhtir nîn in mixabin. Li Başûr herî zede 20, li Rojava 5, li Rojhilat 10, li dîasporayê jî 5 kes an hene ne an jî tune ne. Lê rastiyên ku min got nikarin helwesta min bişkînin. Niha ez li kîjan welatî binêrim muzîka rap, şeweya herî populer e, ez bawer im rojekê wê di nav welatê me de jî wisa bibe.

Ez Dixwazim Li Gelek Deveran Konseran Bidim

Rapperên Kurd di festîval û mîhrîcanan de derdiketin ser dikê lê bi taybetî konseran ji bo rapê nehatibû çêkirin. Di sala 2018an de em li Stenbolê bi navê "Kurdish Rap Night (Vol.1)" kom bûn, me stran û hunera xwe pêşkêş kir. Organîzatorê bernamê ez bûm, pêşkeşvanê konsêrtê



fenomen û şanoger Deno bû. Wekî hunermend ji Ewropayê koma Tolhildan hatibû, ji Bakur ez, Ronî Artîn û Reqso, beşdarî vê şevbihêrkê bûbûn. Ji ber rewşa siyasî ya li Tirkîyeyê, rapbêjên wekî Serhado, Rêzan, Sherif Omerî û Dezz Deniz nikaribûn beşdar bibin. Ez dixwazim di siberojê de konseran li Silêmanî, Hewlêr, Wan, Diyarbekir, Dêrsim û Ewropayê bidim.

Ez Ji Dengbêjiyê Gelek Hez Dikim

Bingeha dîrokî ya muzîka Kurdan dengbêjî ye. Di navbera dengbêjî û muzîka rapê de jî, nêzîkahiyeke xurt heye. Dengbêj jî rapbêj jî di dawiyê hevokan de hevdegan bi kar tînin, gotinên xwe bi lez û li gorî ritma awazan dibêjin. Di berhemên xwe de bi berfirehî qala jiyanê dikin hwd. Bi kurtasî dengbêjî û muzîka rap pir nêzî hev in. Dîroka dengbêjiyê ji muzîka rapê kevntir e û ez difikirim ku rapperên Kurd dema guh bidin dengbêjiyê wê berfirehtir û kûrtir li rapê binêrin. Dixwazim bêjim ku ez ji dengbêjan gelek hez dikim û ji bo min hêja ne.

Daxwazek Ji Bo Xwînerên PopKurdê

Heta ji we tê li muzîkên nûjen û biqelîte guhdarî bikin, piştgirî bidin rapa Kurdî û rapa Kurdî populer bikin.

KURDORÎNO

Kurdan Torîno Şên Kir

Torîno ji bo Chalak Eventsê deriyê Ewropayê bû, loma me girîngiyeke mezin didayê û bi qasî salekê, ji bo çalakiya dê li wir were lidarxistin, em dixebitîn.

Ji aliyekî ve em li ser Skypê bi şîrîkê xwe yî Îtalyanî, saziya Casa Acmosê re, di derbarê mijar û cihên çalakiyan de, hema bêje her roj diaxivîn, ji aliyekî ve jî bê sekin em bi hunermendên dê tevî bibin re diketin têkiliyê. Axirê bername zelal bû û me jî serî li vîzeyê da. Di gel ku di serîlêdana vîzeyê de hin astengî derketin jî me hev motive kir û moralê xwe xurt hişt. Me her 5 endamên Chalak Eventsê jî serî lê da bes tenê ji bo du kesan vîze derket û ev yek jî dihat maneya ku dê li wir barê me hîn girantir be.

Beriya çûyîna me ya Îtalyayê em her pênc kes jî civiyan, me fikr û ramanên xwe kir yek û bi piştjiriya wan a manewî em bi rê ketin.

Çawa ku li Romayê ji balafirê daketim rastî çand, ziman û avahîsaziyeke gelek cuda hatim. Piştî ku di nav çend saetan de li kolanên Romayê bi awayekî mest geriyam, ji bo biçim Torînoyê li trêne siwar bûm. Peywirdarê ku li rawestgehê bilêt kontrol dikirin, piştî bi her kesî re peyivî, hat cem min û çend pirs ji min jî kirin. Dema ku min jê re got "ez Kurd im" çavên wî beloqî bûn û di derbarê Kurdan de çî zanibe, bi kelecaneke mezin yek bi yek, bi lez û bez anî zimên. Piştî ku behsa tehma xwarinên Kurdan ên ku cîranên wî yên Kurd pê dane xwarin kir û pesinand, heyraniya xwe ya li hemberî Kurdan, li hemberî wêrekiya wan anî zimên. Her çi qas ne bi dilê peywirdar be jî trêne gihîşt Torînoyê. Min xatir jê xwest û daketim kolanên Torînoyê. Xebatkarê Casa Acmosê Fabio li wir li benda min bû, piştî me hev dît em bi hev re çûn cihê ku em ê lê bimînin. Li wir cara dawî em li ser bernamayê axivîn. Piştî



KURDORÎNO

Kînem Şahin

esrshnbk@gmail.com

taştiya yekem a li Îtalyayê, li gor peywirandina me herkesî dest bi karê xwe kir. Ez û Fabio em berdestê sibeh, serê şeveqê, nîv-xewî rabûn û me dest bi xebatê kir. Ji bo em pêşwaziya Engîn Sûstam û Mîrza Metînî bikin, çûn Balafirgeha Bergamayê, mêvanên me çûn hotela xwe û em jî çûn cihê bernameyê.

Ji bilî hunermend û rewşenbîrên Kurd, ji gelek deverên Ewropayê rewşenbîr hatibûn. Me bi beşdarên Kurd re guh da rewşenbîr û hunermendên Îtalyan ku qala Kurdan, Erdnîgariya Kurdistanê û edebiyata Kurdan kirin. Piştî bernameyê, me xwarinên jineke Kurd a ku li Torînoyê dijî xwar. Kurdan û Îtalyanan hev nas kir û bi hev re têkiliyek germ danîn.

Piştî bernameyê em çûn Casa Acmosê û di derbarê çalakiyê de em bi hev şewirîn, me fikrên xwe ji hev re gotin. Ev civîna me ya yekem a piştî bernameyekê bû, lê ne ya dawî bû. Em ê piştî her bernameyê li gel hemû westana xwe, bi hev re biciviyana.

Roja duyem Engîn Sûstam, di derbarê Hunera Kurdî û Sînemaya Hevdem de xeber da. Piştî wê çalakiyê, em çûn çalakiya Mîrza Metîn a bi navê “Dramatolojiya Êgir.” Dû re jî em çûn sînemayê û me li filma bi navê “Kurdistan Kurdistan” a Bulent Gunduz temaşe kir. Ev her sê bername jî li cihên cuda pêk hatin. Me eforeke gelek mezin nîşan da û em pir diwestiyan. Lê mala wan ava ku beşdarên Kurd ên ji welatên cuda, ji bo mîhrîcana me hatibûn, bi kêfxweşî û dilwazî alî me dikirin, barê me sivik dikirin.

Roja sêyem bernameya Ozlem Belçim Galîpê ya li ser “Jin Di Diasporaya Kurdan de” pêk hat. Piştî bernameyê bêyî sekin û navber, em çûn Bernameya Bextiyar Elî û Fatma Savciyê ya bi navê “Jiyane Nivîsandî.”

Piştî hemû bername xilas bûn, ji bo xwarinê em çûn xwaringehê. Piştî me zikê xwe têr kir, me dest bi gotina stranên Kurdî kir. Mîşteriyên Îtalyan ên li xwaringe-



hê dema ku em û wê coşa me dîtîn, tevlî me bûn û li ber stranên Kurdî kêf kirin.

Û axirê em hatin roja çarem, yanî roja dawî...

Dîsa wekî her roj, xew li me heram bû û em berdestê sibehê ji xew şiyar bûn, ez û Fabiyê ku heta roja dawî jî gelek aliyê me kir em çûn me mêvan ji hotelê anîn û me berê xwe da workshopa Mîrza Metînî ya şanoya Kurdî. Workshop gelek bi dilê beşdaran bû, bi taybetî jî hevalên Îtalyan di gel ku ji ber mijara Workshopê têra xwe lêdan xwarin jî kêfxweş bûn û her dibişirîn. Piştî lêdanxwarina bi dilxwazî, em çûn fînalê mîhrîcanê, yanî konsera Yelda Ebbasî, Ganî Mîrzo û Ashti Abdoyî.

Dema em gihan wir, em ji ber elaqeya zêde matmayî bûn, salon tijî bû lê dîsa jî rêza ji bo bilêtan heta ber derê derve dirêj bûbû. Performansên bêhempa yên hunermendan û dengê wan ên efsûnî tevlî kincên kurdewar ên Yelda Ebbasiyê, beşdar mest û kêfxweş kiribûn. Konser bi her awayî hêjayî fînalê festivalê ye.

Dotira rojê me û hevalên Îtalyan xatir ji hev xwest û me germahiya Fatma Savciyê, henekên Ganî Mîrzo, gewrebûna Bextiyar Elîyî, xwînşîrîniya Ozlem Belçim Galîpê, enerjiya Engîn Sûstamî, dengê zîz ê Yelda Ebbasiyê, jêhatibûna Mîrza Metînî, hez û kelecana hevalên xwe yên Casa Acmosê li pey xwe hiştin û me berê xwe da Stenbola xopan..



SEYWAN SEIDIAN

“PARTIYÊN KURDAN JI BO ÇAND Û HUNERA KURDÎ JEHR IN”



ROPORTAJ

Ersin TEK


eersintek@gmail.com




ROPORTAJ

Omer Bextiyar

sonmezomer21@gmail.com



Hunermend Seywan Seidian ev demek e li Swêdê dijî. Me derbarê çand, huner, siyaset û gelek mijaran de pê re roportajek kir. Birêz Seidian jî pirsên me bi dilsozî û li gorî rastî, hizr û baweriya xwe bersivandin. De kerem bikin.



“Hêza mirovan ji hêza coxrafyayê zêdetir e”

- “Her kesek xwedî çîrokekê ye”, ka çîroka te çi ye mamoste?

Seywan Seidian: Çîrokek pir kêr e, ger zemanê mirov hebe, rûnê wekî çîrokên hezar û yek şevan çîroka xwe bibêje. Ji ber ku bi rastî jiyana me, ne bes a min, piranî kesên ku li Rojhilata Navîn dijîn, jiyaneke pir zehmet û dijwar e. Erê gotina Îbn-î Xaldûn ku dibêje, “Coxrafya qedera însanan tayîn dike” heye, lê belê ez li dijî wê jî difikirim. Li gorî min hêza mirovan, ji hêza coxrafyayê zêdetir e. Mirov dikare coxrafyayê derbas bike.

Wiha bibêjim, çîroka min çîroka kesekî ye ku bi ser coxrafyayê re gav avêtiye û jê derbas bûye. Ev zêdetirî 15-20 sal in ku tu caran coxrafya ji bo min girîng nebûye û niha jî girîng nîn e. Lê dîsa jî ew astengiyên li ser van axan çêdibin, mirov tu carî nikare ji bîr bike. Bi kurtasî ez penaberek im. Nêzî 20 sal in ku ez ji bajarê xwe Mahabadê derketime û min hebanek rakir û niha jî ew

heban li milê min e. Êdî nizanîm ez ê kengê wî hebanî daynim. (Dibîşire) Beşeke herî girîng ya ji çîroka min jî; çîroka mirovekî bêax e. Yanî ez jî wekî hemû Kurdan im ku axek û neteweyeke me ya tespîtkirî nîn e. Ji ber vê ez tim kesekî penaber bûm. Ev penaberî di malbatê de hebû, lewra min di malbatê de jî xwe wek penaberekî didît. Ji ber ku xewn, nêrîn, raman û xeyalên min ên cuda hebûn. Ez penaberekî rexnegir bûm û li hemberî tu hêz û deshilatê min xwe biçûk nedît û nabînim jî. Ji berê ve jî, her dem li hemberî êrîş, tehdîd, astengî, lêxistin, zîndan û baykotkirinê bûm, lê tu carî min serê xwe netewand û ez ê netewînim jî. Çîrokeke dijwar e ku hêj didome.

“Min ji berê ve dixwest ku bi hesin peykeran çêbikim”

- Tu çawa bi karê hunerên metalî ra eleqedar bû? Çi tu teşwîqî vê kir?

Seywan Seidian: Bi rastî min di sala 2014an de, li Amedê dest bi hunerên metalî kir. Berîya wê bi 15 salan ez bi gelek hunerên din re mijûl bûm. Wekî xweşnivîsî (xettatî), min li Mahabadê dest pê kir û pişt re bi wêneyê re jî mijûl bûm ku ez hê jî didomînim. Ji xeynî vê ez demekê li Başûr penaber bûm. Bi qasî 10 salan ez li gel xanima xwe Rûnak Resûlpûr, bi karê grafîk-dîzaynê re biliyam. Lê wekî ku min got ji sala 2014an vir ve, min dest bi peykerên hesinî kir. Çimkî demekê xeyala min bû ku ez bi hesin hunera peykerê çêbikim.

Balkêş bû; piştî ku ez hatim Amedê, bi du mehan şûn ve, hevalên kolektîfa Suluklu Xanê, avahîya dîrokî ya Sûrê, ji bo me atolye pêşniyaz kirin û atolyeya min çêbû. Îja pir balkêş bû ku ez 11 sal bûn li başûr bûm, bi dehan, bi sedan projeyên me, bi hezaran berhemên me hebûn lê tu carî atolyeyeke yek metreyî jî ji bo me çênebû. Ew derfet çênebû ku mirov bikaribe li gorî dilê xwe, berhemên hunerî çêbike. Di destpêkê de min li atolyeyê xebatên xwe bi daran çêdikir. Em rojekê li Amedê li mala hevalekî bi navê Kek Seyfedîn Dagtân mêvan bûn, pirs kir got ka tu çima bi

daran dixebitî? Min got welle ez pir ji hesin hez dikim ku pê bixebitim, lê niha amûrên wê tune ne. Got makîneyeke kaynakê (welding machine) zêde heye û dema em rabûn min dît ku li ber derî bû û bi erebeyaya xwe makîne anî malê jî. Li ser vê yekê, êdî min bi hesinan peyker çêkirin. Niha jî ew makîne li atolyeya Amedê dixebite, min ji şagirdên xwe re hişt. Ev şewehelwesta wan a germ ji min re pir ecêb hat. Çimkî ez li Başûr rastî tiştêkî wiha nehatim.

“Hewlêr û Silêmanî bûne paytextên pere û derewan”

- Lê mamoste tu li Silêmaniyê jî mayî, tê gotin Silêmanî paytextê huner, wêje û entelijansiyaya Kurdî ye. Li wê derê jî rewşa wisa bû gelo?

Seywan Seidian: Belê rast e ez li Silêmaniyê jî mam. Lê ew a ku tê gotin ne rast e, çimkî Silêmanî paytexta derewan e. Hewlêr û Silêmanî jî paytextên pereyan in, paytextên derewan in, paytextên îxanetê

ne. Tecrubeya min î yanzdeh salan ev e. Ci-vakeke ku gendelî û fesadî ketiye nav xwîn û hizrên wan. Ev gendelî ku min di nav çîna bi nav hunermend û rewşenbîran de dît, kûrtir û zêdetir ji ya siyasî bû, lê hêz û îmkânên wan ne bi qasî yên siyasî bûn, lewma biçûktir tê xuyakirin. Silêmanî û Hewlêr bajarên geribkuj bûn. Eza, zilm û bêedaltiya ku me ji deshilata Kurdî dît, ji ya di-jminên Kurdan kêmtir nebû. Berjewendiyên şexsî, berî her tiştêkî ye. Başûr li gorî min tenê sê tişt in; pere, xwarin û seks. Di hemû kabîneyan de wezareta herî gendelî lê bû Wezareta Rewşenbîriyê bû. Li gorî min; yek ji mercên herî girîng ji bo kesayetiya rewşenbîran, serxwebûna wan e. Ev mijar di nav kesayetiya başûr de hema hema, qet tune. Li bajarek ku hejmara mizgeftan sed qat li pirtûkxane û navendên çand û hunerî zêdetir in, li bajarek ku niha mele, serok û eşîr sed qatî ji hunermend û rewşenbîran bi bandortir in, zilmeke mezin e ku bi paytextê rewşenbîriyê bê naskirin.



“Îslam bûye belayek ji bo hunerên dîtbarî”

- Baş e mamoste, te li Amedê dest bi çêkirina peykerên hesinî kir û çend pêşane jî vekirin. Berhem û xebatên te li Bakur û li Amedê çawa deng vedan? Gel çawa pêşwazî kir û tu wê demê rastî bertek û rexneyên çawa hatî?

Seywan
Seidi-

an: Ev pirs çend alî ye. Yanî li aliyekê bersiveke wê ya dîrokî heye. Ji ber ku mixabin piştî Îslam hatiye, Îslam bûye belayek ji bo hunerên dîtbarî. Çimkî hemû hunerên dîtbariyê têne qedexekirin, ku heta niha jî didome. Mesela li axa Kurdistanê yan li coxrafyaya Îslamê, beriya 400 salî tu nikarî wêne, tablo yan jî peykerekê bibînî. Ji ber vê hezar û 400 sal in ku hunerên dîtbarî qut bûne di nav civakê de.

Di sedsalên borî da, ku bizavên modernîteyê dest pê kir û têkilî bi cîhanê re çêbû, wan hunerên li gelek welatên Îslamî jî dest pê kirin. Kurd jî ji wan gelan yek e, lê gelekî dereng dest pê kiriye. Dikarim bibêjim ku dîroka peykervaniya Farisan, hema hema 100 sal beriya ya Kurdan e. Ya Tirkan û ya Ereban jî hema wisa ye. Mesela, ez ji we pirs bikim, ka hûn li Bakur çend kesên peyker-van nas dikin? Mixabin di nav Kurdan da beriya 50 salî kes nîn e ku li



ser peykerên hesinî xebitîbe. Lê beriya 50 salî li Îranê peykervanên ku bi hesin xebitîne hene, lê belê di nava Kurdan de nîn in. Ji ber vê, ev huner ji bo Kurdan gelekî nû ye. Heta li gorî hin kesan divê qey li din-yayê cara yekem ez xebitîme. (Dikene) Lê tiştêk wiha nîn e. Jixwe rêz jî ne muhim e ku tu neferê yekemîn î yan yê dehemîn. Pir girîng e ku tu çawa çêdikî, çi çêdikî, ji aliyê estetîkê ve, hêla ruhî ve tu çi qas dikarî wan xurt bikî, ev girîng in. Ev aliyekî tarîxî ye ku gelê me nedîtibû.

Li aliyê din, ev huner li her deverê balê dikşîne. Niha ez li Swêdê dijîm, li vir jî bal kişandiye. Mesela min bi alîkariya Muzexaneyê Arkeolojiya Mêrdînê, filmeke niv-metraj a bi navê “Bayekî Xewnên Peykerên Min Dizîn” kişand. Di sala 2016an de min li deh gundan, deh pêşangeh vekirin. Ev fîlm jî xebatê wan deh rojan e ku gel çawa li vê hunerê dinêre. Di wê filmê de her kes dibîne ku gel çawa ji hunera modern hez dikin û fêm dikin jî. Niha ev yek jî pir girîng e ku piştî modernîteyê qutbûneke gel û hunerê çêbû. Yanî huner û gel pir ji hev dûr ketin. Ev jî tiştêkî dîrokî ye. Çimkî piştî modernîteyê huner, diçe nav muze û galeriyan. Li vir jî her tim du çîn û sinif derdikevin. Hunermend û burokrat. Li bajarê ku ez niha lê dijîm (Gävle) jî rewş her wisa ye. Nêzî 80 hezar kes li vî bajarî dijîn, lê dema pêşaneyek çêdibe, bîst kes tune ye.

“Saziyeke ku hunera Kurdî li navendekê bicivîne tune ye”

- Gelo mimkun e ku di roja îroyîn de mirov behsa hunera modern a Kurdî bike?

Seywan Seidian: Bêguman hunereke modern a Kurdan heye. Bi rastî bersiv gelekî berfireh e. Mebest kîjan huner e? Wêne ye, sînema ye, peyker e, şano ye, helbest e an roman e? tu kîjanê dibêjî. Dema em li van binêrin, di serdema modern de, nexasim di 30-40 salên dawiyê de gelek berhemên baş û biqîmet çêbûne. Hunera hevdem heye. Lê pirsgerêka girîngtirîn ew e ku saziyeke navendî tune ye ku hunera Kurdî li deverêkê bicivîne.

“Ez partiyên Kurdî ji bo çand û hunera Kurdî wek jehrê dibînim”

- Li gorî te ev ji ber bêdewletbûn û bê sazîbûna Kurdan e?

Seywan Seidian: Li aliyekî meseleya bêdewletbûna Kurdan e, lê li aliyekî jî helwest û hemaqeta siyasî ye. Ez hemû partiyên Kurdî ji bo çand û hunera Kurdî wekî jehrê dibînim. Hemû wekî alav li hunerê dinêrin. Hunera ku di xizmeta wan de be dipejirînin, lê li hesabê wan neyê yan davêjin kêlekê, yan jî bi çavê dijminane lê mêze dikin. Lê mesele ne bes dewletbûn an bêdewletbûn e jî. Di hemû partiyên Kurdan da çand û huner tiştên herî dawî ne. Yanî navendek tune be, sazî tunebin, xebatên arşiv û berhevkariyê tune bin, ev kar zehmet e.



“Hunera Kurdî û hunermendên Kurd bêxwedî ne”

- Heke em behsa hunereke berbiçav û şênber bikin, ji bo Kurdan rewş û tabloyeke çawa derdikeve holê? Kurd di kîjan qonaxê da ne?

Seywan Seidian: Niha pirseke din jî heye; em behsa kîjan perçeyê dikin. Em behsa bakur bikin, li gorî min bakur ji bo hunerên dîtbarî perçeya herî qels e, Tirkîye jî qels e. Li Tirkîyê peykervaneke/î bi nav û deng ku navê wî di bîra min da mabe tune ye. Ez nas nakim, ez nebêjim tune ye, lê xuya ye neketiye nav civakê.

Li gorî min; ji bo wêne û resmê, perçeya herî xurt Rojava ye. Hunermendên Rojava pir modern in û pir zêde ne jî. Li vir biza-

veke pir xurt a wêneyê heye. Ji bo peykerê, rojhilat pir pêşeng e. Li bakur peyker qels e, heta rewşa peykerê pir xirab e, lê wêne li pêş e. Başûr jî ji hêla peykerê ve wek bakur e, lê di warê wêneyan de çêtir e. Ez 11 salan li Başûr bûm, lê ez niha nikarim nimûneyeke baş ji bo peykerê bêjim.

Li alfyê din, hinekî zehmet e ku mirov bêje Kurd ji bo hunerên dîtbarî di kîjan qonaxê da ne. Çimkî huner, bi taybetî jî hunera dîtbarî hunereke şexsî ye. Wekî hemû gelên din, ez dikarim bibêjim hunera Kurdî ji hunera Erebi û Tirkî paşdetir nîn e, ne kêmtir wan e. Lê hunera Kurdî û hunermendên Kurd bêxwedî ne. Problemeke me ya herî mezin jî ew e ku sponsor tune ne. Kesên ku bibin sponsor tune ne. Jixwe huner bi xwe nikare xwe fînanse bike.



“Ji bo Kurdan huner nebûye hewcedarî û perçeyeke jiyane”

- Gilî û gazincên bi vî rengî zêde ne, li gorî te dewlemend û karsazên Kurd çima nabin sponsor? Gelo ji ber ku karekî beredayî (!) dibînin nabin sponsor û xwedî li hunera Kurdî dernakevin?

Seywan Seidian: Ev jî çend alî ye. Nêzîkî 19 sal in li gel xanima xwe Rûnakê, em bes bi karê hunerê re dibilin. Me tu carî karekî din nekiriye. Ji ber vê, kesên ku dibêjin mirov nikare bi hunerê bijî, ez bi xwe vê napejirînim. Min bi xwe tecrube kiriye, ez dizanim ku dibe, lê belê pir zehmet e. Wekî din têkilî bi pirsê we, huner neketiye nava civakê. Yanî huner nebûye pêwîstiyê civakê. Wek nimûne; em çend heval bin û biçin xwarinekê bixwin, ji ber hesab em dikarin şer bikin, lê em 10 TL'yî nadin pirtûkekê, 150 TL'yî nadin tabloyekê. Qasî heqê xwarinekê ye, lê ji bo me problem e.

Aliyê herî nexweş û zehmet ev e, huner nebûye hewcedarî û perçeyeke jiyane. Tu biçî ku dera welatên Ewropî, heta Gurcistan û Ermenistanê jî tu li otel û malekê îlleh rastî tabloyeke orijînal tîyî. Lê belê li çar perçeyên Kurdistanê û heta li Tirkîyê jî bigerî, encax bi îstisna tu biçî malekê rastî tabloyeke resen werî. Mixabin zengîn û karsazên Kurd bê agahî û helwest in. Gava ez karsazên Cîhû (Yahûdî) û Kurd didim ber hev, giriyê min bi halê me tê.

“Ji îlhamê bawer nakim”

- Îlhama te çi ye? Çi şewqê dide ku tu hunera xwe çêbikî?

Seywan Seidian: Ez bi xwe zêde ji îlhamê bawer nakim. Tu caran îlham ji bo min nehatiye ku ez tiştêkî çêkim. Ez bi xwe helbestan jî dinivîsim, lê îlham nehatiye. Atmosfereke rûhî çêdibe, lê ew jî paşxaneke xurt dixwaze. Paşxana te ya afirandinê, ev girîng e. Ez bi xwe gelek caran ji bo peykeran jî dibêjim ew kesên ku hostayê hesinkariyê ne, ji aliyê teknîkî ve ji min gelekî çêtir in, ez bi xwe ji aliyê teknîkî ve gelekî qels im. Lê ew paşxane (background)


girîng e. Beşeke jê edebiyat, psikolojî, sosyoloji, dîrok û teknîka hunerê ye. Gava ku ev digihîjin hevdû, asta berhemeke baş derdikeve holê.

“Ez ji vê serdemê nefret dikim”

- Peywendî û eleqeya huner û hunermendan li gel pere / mediyatê çawa ye û divê çawa be?

Seywan Seidian: Bersiva vê dualî ye. Alîyek îmkan e. Ji ber ku bêyî îmkanan huner çênabe. Li ser meselê; ji bo wênesazekî atolye, firçe, qelem û materyal lazim in ku ev bi îmkanan ve girêdayî ne. Ji bo sînema û hunerên din jî îmkan yanî pere lazim e. Ji bo peykervanekî jî her wisa ye. Yanî pere pir hewce ye, li aliyê din jî her tişt bi pereyan nabe. Bila şaş neyê fêmkirin, ez nabêjim dema pere hebe her tişt çêdibe. Dibe ku hunermend xwedî îmkan nebe, lê pirî caran hunermend ew kes e ku bi xwe îmkanan jî çêdike.

Li aliyê din, em li dîrokê dinêrin ku di civakê da tenê berhemên hunermendan



mane. Di civaka Kurdan de berhemên Melayê Cizîrî, Şerefxan û Nalî mane. Li gorî min hewce dike ku mirovên herî zengîn di nav civakê da ev kes bin. Îmkanên herî mezin ji wan çêdibin, ji ber ku berhemên wan ji gel re dimînin.

“Di navbera Orhan Pamuk û dikandarekî de ferq tune ye”

“Li bakur mafyayên şoreşger hene”

- Wek berdewamîya pirsar jorîn em vê mijarê jî ji te bipirsin. Îmkan hinekî bi îqtidarê re jî girêdayî ye. Gelek nivîskar û hunermendên ku xwe dispêrin îqtidarê ji bo wan deriyê derfet û îmkanan jî vedibe mesela. Li gorî te peywendî û eleqeyeke çawa di navbera hunermend û îqtidarê de heye?

Seywan Seidian: Berî her tiştî ew îqtidar çawa ye? Li gorî min li ser rûyê dinyayê desthilatdariyeye baş tune ye. Lê mirov dikare bibêje çi qas xirab in, çi qas bêzîrar in? Mixabin di Rojhilata Navîn de hemû îqtidar xirab in, pîs in, ferqa wan tune ye. Îja ew îqtidar a Kurdan e, ya Erebb, Fars û Tirkan e, ferq nake. Bi milyardolaran pere didin alavên şer û gelan dikin dijmin û neyarên hev. Lê dema behsa hunerê tê kirin, hemû jî dibêjin îmkana me tune ye.

Îja em werin ser eleqeya huner û desthilatdariyê. Heke zirara wê desthilatdariyê tune be, mirov dikare pê re bimeşe. Ji ber ku ev peywira destiltdar e ku xweşikî ji bo civakê çêbike. Lê mixabin wekî min li jor got, siyaseta Kurdî ji bo çand û hunera Kurdî jehr e. Ez medya û televîzyonên Kurdî jî ji bo kultur û hunerê wek jehrê dibînim. Hemû wisa ne. Bes ji bo alaveke propagandayê bi kar tînin. Stratejiya tu partî û televîzyonekê ji bo hunerê tune ye.

Li aliyê din; hunermend jî pir pasîf, bêbandor û oportînîst in. Ji bo çapkirina pirtûkên xwe û kişandina filmên xwe, ew xwe mecbûr hîs dikin ku bikevin bin bandora desthilatê. Bi taybet li Başûr ev pir e. Em bi Soranî dibêjin ew dorav (binketin) in, yanî winda kirine. Li bakur jî oportînîzm

heye. Li hemberî desthilatê çî Tirk çî Kurd serî ranakin. Heta min ev gotin li Tirkîyeyê jî digot; ez niha di navbera Orhan Pamuk û dikandarekî de ferqê nabînim. Çimkî wek rewşenbîrekî nikare guhertinekê çêbike. Hêza wan heye, lê nikarin û nizanin vê hêzê çawa bi kar bînin. Cesaret winda bûye û tune ye. Bêguman metirsî û rîska wê jî pir in. Ji ber vê sedeme jî hêza wan a civakî sifir e. Ez 4 salan li bakur mam, min dît ku di nav me de “mafayên şoreşger” hene. Li ser navê şoreşê mafyatiyê dikin û şoreşê difroşine millet. Tu nikarî ji wan re tişteki jî bibêjî. Min tu kes nedît ku li hemberî wan bisekine û bibêje “hûn kî ne!” Biçin li danûstaniyên ekonomîk ên şaredar, sazî û televîzyonan binêrin. Ev li hemû Rojhilata Navîn hene, mixabin di nav me da jî wisa ne.

Em we ji hunerên metalî û peykersaziyê dinasin. Lê tu şîran jî dinivîsî û bi sînemayê re jî eleqedar î. Tu dikarî hunera xwe hinekî bi me bidî naskirin û bi kurtasî bêjî ka gelo heta niha çî xebat û projeyên te çêbûn?

Seywan Seidian: Wellehî ez jî nikarim zêde bibêjim. (Dibîşîre) Dikarim bêjim hunera min peyker û peykervanî ye. Zêde materyalên peykerê nîn in. Darîn, hesin, bronz û çimento ye. Yanî zêde materyal hewce nîn in. Ez bi xwe ne tenê peykeran çêdikim. Fotografan jî dikşînim. Çend



pêşaneyên min ên fotografê çêbûne û wê çêbibin jî. Bi edebiyatê re jî mijûl im. Pirtûkeke min a helbestan jî (“Le Çawerewanî Hîç Da” / Li Bendewariya Hîç De) li Kerkûkê di sala 2012an de hat çapkirin. Di warê sînemayê de jî xebatên min hene. Gelek berhemên min ên grafik-dizaynê jî çêbûn.

Min pêşaneyeke fotografan li Alsancaka Îzmirê, galeriya bi navê “Germiyan”ê vekir, pêşaneyek li gundekî Silêmaniyê vekir, îsal 4 fotografên min li Swêdê beşdarî bîaenalekê bûn. Herî dawî pêşaneya min a wêne û seramîkan, di 23yê Adarê de li Swêdê, li bajare Gävle çêbû.

Di sala 2010an de min filmek çêkir lê zêde teknîkbar nîn e. Di 2018an de min filmeke din çêkir. Li Mêrdîn û Amedê me kişand, 43 deqe ye, belgefilm e, li ser pêşangeh û xebatên min ên li deh gundên Mêrdînê ye. Min hîn jî bi fermî ev film belav nekirine. Navê filmê “Bayekî xewnên peykerên min dizîn” e.

-Mamoste niha çi xebat li ber destê te hene?

Seywan Seidîan: Dinyayeke xebat hene. Niha li vir atolyeya peykersaziyê çêbû, ku ez niha li vir roportajê didim. Atolye bi destê şaredariya Gävle ji me re çêbûye û ji derveyî vê yekê, ji bo du salan hemû îmkânên jiyana me didin ku ez ji wan re gelek spas dikim. Atolyeya din jî ji bo wêne û seramîkê ye. Di meha çaran de, pêşaneyeke me ya malbatî çêbû, di meha pêncan de pêşangeheka Rûnakê ya îlûstrasyonê li Stockholmê çêbû..


Niha ji bo 2-3 filman amadekariyan dikim. 2 dokumanterî, yek jî Fîkşin e. Yek li ser “sêva mîxekreş” e. Beşa duduyan a belgefilma min e. Li aliyê din xebatên fotograf û edebiyatê didomînim.

Ji bo dema bê gelekî projeyên min ên fotografan hene. Divê bîn dîtîn. Divê ez li ser xebatên xwe neaxivim. Rexnegir divê biaxivin, lê mixabin tune ne ku biaxivin. Çend kurteçîrokên min hene. Herî dawî 10 çîrokên min ên modern û orijînal hene ji bo zarokan. Ew niha ji bo çapê amade dibin.

-Mala we ava mamoste.

Seywan Seidîan: Avatir, serkeftin bo we.





ME JI 10 KESAN PIRSÎ

Te dixwest bi kîjan karakterê/a romana kurdî re hevaltî bikira? Bo çî?



Sevda Esen

Min dixwest bi “Cemşîd Xan”ê lehengê romana Bextiyar Elî re hevaltiyê bikim. Ji ber ku ez jî ji aliyê fizîkî ve dişibim wî. Wekî wî zeîf im, li benda bayekî xurt im da ku ew ba min bifirîne. Bêyî ku tonek pere bidim bilêtên teyarê, wisa belaş li hemû cîhanê bigerim. Helbet, bi şêweyekî turîstîk.



Berfin Ayşe Öğüt

Mixabin piraniya lehengên romanên kurdî mirovên navsere ne. Min dixwest bi lehengekî ciwan re hevaltî bikira, xortekî jîr û zana. Helbet divê ew xort di heman demê de ji zimanê xwe û welatê xwe jî hez bike. Min ew xort di romana “Leqat’ê ya Receb Dildar de dît.

Xortekî bi navê Hêja Cemîl, li Stenbolê mezin bûye, lê hesreta welêt wî ber bi Diyarbekirê ve dikişîne. Dixwaze were li şopên bavûkalên xwe bigere. Dixwaze li ser axa xwe wek Kurdekî bijî. Di romanê de gotinên wî yên dawîn ev in: “...dixwazim bi dengên Kurdî hişyar bibim û bi awazên Kurdî bijîm. Ji bo min êdî navê jiyane ev e.”



Mem Xerzan

Las... Lasê ku êşeke giran dikişand, êşa jibîrbûyîn û biyanîbûnê.

Mirin, wendabûn, tenêti...

Carinan her çiqas lehengê romanekê “fictive”(kurmaca) be û jiyana wî awarte be jî, mirov xwe dixwe şûna wî û wekî wî hîs dike. Jixwe roman ji tecrube û serpêhatiya mirov derdikevin, her çiqas fictive bin jî nivîskar ji tecrubeyên jiyana xwe sûdê digire û parçeyek ji xwe dide wan, yanî hinek rastiya wan jî heye. dema min “Gulên Şoran” a Eta Nehayî xwend, lehengê romanê Las nêzîkî xwe dît. Min xwest di wê tenêti û wendabûna wî de pê re bim û di rêwîtiya xwekuştina wî de, wî tenê nehêlim.

“Sibeha berî ku bide ser rê, ji dayê Gulê re got “Diçim bimirim.”



Gül Ölmez

Min dixwest di gel Emîral Axayê di “Mijabad”ê de hevaltî bikira. Emîral Axayê ku parsekê avê, yê ku bi satila di destê xwe de ji ser maseyên qehweyên Mahabadê av kom dikir ji bo xilaskirina Mahabada ku têkçûyîna wê di romanê de, bi hêmana werîsan hatiye motîfkirin. Emîral Axa cudatirîn lehengê edebiyata Kurdî ye ku cudatiya wî li gorî leheng û xwînerên romanê wek dînîtiyekê tê. Li ser maseyan avê kom dike ku benderekê ava bike ji bo komarê. Îdiaya Emîral ew e ku ger Kurd xwedî benderek(behrek) bin, dikarin xwe biparêzin. Dibêje; - ‘Begane can dezanî bo çî Şêx Mehmûd be ser nekewt? Şarî Slêmanî bender nebû, şiya hîç in. Derya nebe komar hîç e.’ Dizane wê dawiya komarê bê û dibêje ger rê gelekî li ber komarê teng bû wê Pêşewa li gemiyekê siwar be û xwe bigehîne peravên dûr. Emîral Axa rêyeke nû li ber xwexilaskirin û xweparastina Kurdan vedike. Xwedîdewletbûna Kurdan bi hêmana avê ve girê dide: ‘Derya dikare Mahabadê biparêze, ne hesinê sar ên ji dewletên qeşayê.’



Abdurrahman Aydoğdu

Bê guman ez ê bibêjim min dixwest bi Kameranê Selma yê lehengê “Qesra Balindayên Xemgîn”a Bextiyar Elî re hevaltî bikira... Ji ber ku em her du jî du evîndarên nola hev bodle ne.

Kameran kesekî çito ye?

Kameran kesekî jîr û jêhatî ye. Her wiha kesekî evîndar e jî. Ji bo ku daxwaza evîndara xwe bîne cih, 8 salan li dinyayê dikeve pey balindeyan. Piştî 8 salan balindeyên cîhanê yên herî bicoş û dengxweş ji evîndara xwe re tîne. Evîndara wî jî ew kes e ku dinya ji pirtûkan nas kiriye. Loma jî dixwaze bi kesekî dinyayê zane re bizewice û ji bo vê jî Kameran dipirse û dibêje “Cîhan tişteki çawa ye, te çî dît? ji min re bibêje.” Lê Kameran bersiveke hêsan nade evîndara xwe! Dibêje “Ez nikarim ji te re behsa dinyayê bikim lê eger tu bi min re bizewicî, ez ê ji bo her şevêkê ji te re çîrokekê bibêjim û behsa çîroka cîhanê bikim!” Bi vê bersiv û jîrekiya xwe, dilê evîndara xwe qezenc dike...



Elenî Hejar

Min dixwest bi nivîskar û qehremana “Xewnnivîsk”a “Ristika Morîkan” a Fatma Savciyê re hevaltî bikira. Ewa ku hertim li xewnên xwe dialiqe, ewa ku bîranînên wê bi xewnên wê re dibin yek û qirka wê tijî dikin, ewa ku Êvar tim dixwaze wê li dinyaya “rasteqîn” bihêle lê ew dilikume..



Mistefa Zengin

Min dixwest ez bi lehengê pirtûka “Pepûleyî Kafka” ya nivîskarê Başûr Huner Kerîm re hevaltîyê bikim. Lehengê wê romanê, ku navê wî Kurde ye, wek lehengê romana “Veguherîn”ê ya Franz Kafka, sibehekê bi xewneke giran hişyar dibe û dibîne ku wekî di wê xewna giran de navê wî guheriye û wek nasname bûye mirovekî Erebi. Belê, min dixwest ez bi wî re hevaltîyê bikim, da ku wate û encama veguherîna nasnameyê, bi wî re bijîm û fêhm bikim.”



Mem Jan

Sertac Karan, “Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî” (Şener Özmen),



Îqlim Milanî

Sewsen Fîkreta “Qesra Balindeyê Xemgîn.” Ji ber ku çendîn hevbeşiyên me hene. Ew jî wekî min laşlawaz, hezkiriyê bavê xwe meraqdarê cîhanê û cîguhertinê bû. A rastî difikirim; gelo ez bûma min ê ji xwezgîniyên xwe tiştekî werê ecêb û watedar bixwesta an na! Ya xweş ew e ku her du xwazgîniyan peyama girtin û hilbijartina Sewsen jî di cî de bû, her çiqaş mirad jê nedîtibe jî.



Emine Değır

Di romana “Qesra Balindeyên Xemgîn” de Sewsen, bi ser azadiyê û evîneke serbixwe ve ye. Ji bo min Sewsen gelekî jîr e, ji ber ku dixwaze dildarên wê jî piştî ku li dinyayê bigerin û bibînin, biryara xwe ya evîne bidin... Ji ber ku jinên Kurd di bin bandora pergaleke pederşahî de ne û bi heman mêjiyî difikirin. Sewsen cûda ye. Jineke ku wisa azad difikire, ji bo min hevaleke bêhempa ye.



POP PIRS

Sakîna Teyna

Di sala 1973an de li Gimjimê hatiyê dinyayê. Ji sala 1991an pê ve, di nav Navenda Çanda Mezopotamyayê de karên xwe yên muzîkê kirin.

Di sala 2012an de yekem albûma wê "Royê Mi" derket. Heman sal bi Nurê Dilo-vanî û Nazê Işxanê re koma "Trîo Mara" ava kir. Bi vê komê re, di 2013an de albûmeke bi navê "Derî / Behind the Doors" derxist. Herî dawî di sala 2015an de komeke bi navê Sakîna & Friends ava kir. Sakîna Teyna, niha xebatên xwe li bajarê Viyanayê didomîne..

Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Şerm mir! (Lîstika şanoya “Dîsko/5 No’lu” ya Mîrza Metin)

2-Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Beriya çend salan, Min û dayika xwe, li ser dikê me bi hev re stran gotin. Xemgînî û bextewarî di nav hev de bû!

3-Tehemula te ji çi re tune ye?

Neheqî! Bêyî ku mirovekî/ê binasî, bi bi-hîstina tiştên derbarê wî de hukimdayîn, ked û keseyatiya mirovekî/ê tune hesabandin.

4-Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Min ê bixwesta ku Mêryem Xan nas bikira û çîroka wê ya xemgîn ji wê guhdar bikira. Wek jinekê, ew hêza wê ya di nav civakeke kevneperest de, ji ku dihat, jê bipirsiya.

5- Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Ez bi orkestrayeke senfonîk, stranên Kurdî bistrêm û bi vê projeya xwe bikaribim werim welêt.

6-Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje.

Tu jî wekî min ger bibûna Kurd / Ev xurtiya te dibû kul û derd ey Xabûr Xabûr!

7-Çi kenê te tîne?

Mêrê ku hundirê wan vala ye, lê xwe tişteke dihesibînin û wexta ku ez di nav xelkê de bikevim erdê!

8-Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Herikîna avê û dengê diya min.

9- Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Ji bo azadî û ji bo mafê jinan têkoşîn.

10-Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Her aliyekî xwezayê, êş û êvîn.

11- Dîmeneke çawa te aciz dike?

Tundiya li hemberî jinan, zarokan û heywanan û belavkirina dîmenên wisa ya li ser medyaya sosyal.

12-Te dixwest tu li ku derê bijî?

Bila cihekî min ê sabît nebe. Ji ber karê xwe yê hunerî, jixwe ez pir digerim. Gelek xeyalên min pêk hatin. Hinek hîn mane. Hinek dever hene ku ji bo gerê baş in, lê mirov nikare lê bijî. Ez ji cihê xwe yê niha razî me. Lê qedexeya çûyîna welatê min bi xwe ji bo min gelek zehmet e. Ez dixwazim cîhaneke bêsinor û azad hebe. Ew dem her dever wê hêjayê jiyînê be.

13-Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Dilnizmî û rêzgirtina mirovan bo min gelek girîng e. Lê carinan dilnizmiya min bê sinor e. Hinek mirov ji vê tiştê fêhm nakin û dixwazin pê li kesayetiya min bikin.

14-Tu dixwazî çawa bimirî?

Ger mimkun be bila mirineke di dema xwe de be :) Ez hêvîdar im ku di nav aramiyekê de bimirim. Bila nexweşiyê demdirêj û biêş nebe. Mesela dema ku razam, ji xew şiyar nebim. Lê ev daxwazên gelek luks in.

15- Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Naxwazim goreke min hebe.

JI BERÊ TA ÎRO KURD ÇI DIXWIN ÇI VEDIXWIN

'Ne xwar ne jî da hevalan,
Genî kir û avêt newalan.'



SIHET

MEHMET AYDIN

diyetsiyenmehmetaydin@gmail.com

Di serdema 21emîn de hezstendina ji jiyane bi çend tiştan ve hatiye girêdan. Xwarin-vexwarin, dewlemendî, îtîbar hwd. Çendek ji wan in. Her wiha “Hêzstandin” jî bi van ve didine girêdan.

Xwarin-vexwarin esasê jîndariyê ne û mirov di her demên mirovahiyê de bi şiklên curbecur bi kar anîye. Xwariye, xwariye û ti car têr nebûye. Ji Adem û Hawa vir ve ev birçibûn didome. Jixwe ji ber bînefsiya xwe Adem û Hawa ji bihûştê hatin avêtin. Va ye ew û va ye neviyên wan.

Di Nav Kurdan de Wek Çandekê:
“Xwarin!”

Di 5 milyon salan de, li ser rûyê dinyayê belavbûn û zêdebûna mirovan, pê re jî xwarin, şiklê xwarinê, sedema xwarinê û cureyên wan hatine guhertin û vê jî di her miletî de çandekê serbixwe ava kiriye.

Ev çand bi xwerekên nû, bûyer û têkiliyên nû ve hatiye nûkirin. Her wiha di nav me Kurdan de jî ev çand cihekî girîng digire. Jiyana koçerî di piraniya gelê Kurd de, heta demeke nêz jî dewam dikir. Havînan li zozanan, zivistanan jî li germiyanan konên xwe datanîn. Ji ver ku koçer bûn, piranî xwarinên wan bi goşt, şîr, giyayên demsalî û cureyên wan pêk dihatin. Rûn, nivîşk, qelî, penîr û hwd.

Di derbarê xwarin, vexwarin û metabexa Kurdan de çavkaniyên nivîskî mixabin negihîştine dema me. Li aliyê din, li Başûrê Kurdistanê fosîlên Miyan ên aîdî Beriya Îsa sala 600an hatine dîtin. Di kolanên arkeolojîk ên li Rewandûzê de derket ku bi demê re jiyana Komkerî derbasî jiyana cotkarî û heywandariyê bûye. Lêkolînên pişt re jî didin xuyakirin ku teknîkên mihafezekirina goşt û zerzewatan jî bi pêş xistine.



Di dawet, mîhrîcan, teziye û cejnan de, raxistina sifreyên mezin di çanda Kurdan de xwedî cihekî muhîm e. Ev xwarin, li gorî demsal û dewlemendiya mirovan diguherî. Hetta goştên mî, bizin, karik û mirîşkan ên li ser birincê nîşaneya dewlemendiyê bû. Li ber van xwarinan, fasolî û tirşik jî dihatin çêkirin. Di Newrozan de li ber kahnî û bestan seyran dihatin lidarxistin û xwarinên wekî kutilk û pirax dihatin çêkirin. Ev edet hê jî li gelek deverên welêt hene.

Xwirekên ku di Aşxaneya Kurdan De Zêde Tên Xwarin!

Di çanda xwarin û vexwarina Kurdan de, xwarina sereke goşt e. Her wiha goşt statuya dewlemendiyê ye. Dema ku em li dîroka Kurdan dimeyizînin; ji ber ku her dem çiyayî bûn û tim koçber bûn, debara xwe bi heywanan dikirin. Ji ber vê jî goşt bi hêsanî dihat peydekirin. Ne tenê goşt, cûreyên din ên ku ji heywanan dihatin peydekirin, dixwarin. Wekî şîr, mast, penîr, nivîşk û çerm, kurk û heta ji pirça wan jî îstifade dikirin.

Her wekî din goşt, ji bo me Kurdan tiştêkî pîroz e. Lewra xwarina herî biqedr, çêkirina goşt e. Ku tu li maleke Kurdan bû mêvan û tu ji bo wan mêvanek biqedr bî, ji te re ji sedî sed wê goşt çêkin(xilasiya te nîne ♪). Lê asta “qedra” te li gorî cûreyên goşt(ê mirîşka an goştê sewêl) jî tê nîşandan.

Di sala 2014an de ez ji bo 20 rojan çûbûm gund. Hûn dizanin ku yek ji bajar tê, nasên wî kesî şîva wî çêdikin. Ji wan 20 rojan bi rihetî 15 rojan min goştê mirîşkê xwar. Niha şikir dikim ku min zimanê Kurdî ji bîr nekir û nekir “qîdqidîn” ♪.

Ji aliyê tenduristiyê ve ku em binêrin; yekemîn sedema zêdehiya nexweşiyên qelb(rawestan, xitimandina demaran, kolesterol û hwd.), Qansêra roviyê stûr(Colon Cancer), Qelewbûnê, zêdexwarina goşt e. Di nav me Kurdan de pirtirîn sedemên mirinê jî ev nexweşî ne mixabin.

Birinc, savar, nohk, fasolî û nîsk, daxlên ku tên xwarin in. Di nav dewlemendan de birinc, di nav feqîran de savar bêhtir tê xwarin.

Bacanaaa reş(balîcan), xiyar, tivr û pîvaza ku bi navê “Sêva Kurdan” tê zanîn, zerezewatên ku zêde tên xwarin in.

Li gorî statu û dewlemendiya mirovan, hejmara xwirekên ser sifreya wan zêdetir dibûn tabî. Em bi gotineke bavûkalan meselê li vir biqedînin:

“Nan û dew, taştiya derew; nan û mast, taştiya rast; nan û şîr, taştiya mîr.”





KOVARA KITÊB HUNER Û ÇANDÊ

KUND